## 15 TEBAXÊ  1998

Hevala Zîlan Leyla, Guler, Sema û hevalê Fikrî baygeldî, Mehmet Çimen, şehîdên me 15 tebaxê, li we hemûya pîroz be!

Pîroz be li gelê Kurdî ku hezar sala di bin zulm û zordariye da. Pîroz be, li şêrvanên ku qurşûna yekem di dilê dijmin de sar kirî. Pîroz be li birêz Abdullah Öcalan û civata



dorpaş wî re.

Şervanên azadiye li vê rojê sala 1984 kirasê koledarî ye çirand in. Li vê rojê gelê Kurd serbilind bû. Li vê rojê dengê gelê Kurd li cîhanê belav bû. Ez dixwazim bi kurtayî ji xwendevanên  me re qala vê rojê bikim.

Çarde sala di ber ve,  vê îro rojê wekî nûçeyek li hemû cîhanê belav bû. Li Tirkiyê Kurda serhelna ye. Li rojava yî Tirkiyê ji aliyê terorîstan ve hat dagir kirine.

Di dest wan terorîstan de çekên pir mezin hene, gunden Kurda talan dikine.  Ew xeberên desînformationa ji aliyê Roma reş ve tên weşandin.

Lê piştî wan xeberan sê roj keten navberê cîhanê zanî ku ew xeberan ne xeberên rast in û derewên Tirkaye yê û derewa medyaya wan nin.

Hevala delal, bi derewan kes di ser Roma reş re tune. Ew ji aliyê derewa pir baş elimîne. Gava ku serhildanên me kevine berê jî dibûn hema dibêjin dervayî Tirkiye yê, hemû cîhan dixapandin. Digot in grubeka ji du sê kesên li wî alî serî rakirin, ew jî me paqij kirin. Ji cîhane wedişartin, ev rûreşiyên ku li me dikirî. Lê bi wan derewana




hetanî roja îro hatin. Îtibara wan êdî li cîhanê bi qasî pênc qurişa nema ye.

Ew roja yê va roja yê, ordiya Roma reş ji heqî terorîsta derneketin û dernakevin jî.

Di berî wê qurşuna yekem a ku hatî avêtine, meriva nediwerî ku bibêjin em Kurd in û welatê me Kurdistane. Zimanê me Kurmancî ye. Li vê rojê gelê me yî ezîdî bi cesereteka mezin dera hole ket gotin; em Êzîdîn e. Îro em di saya PKK e da û mêrxazan re dibêjin em Kurdin, welatê me Kurdistane. Milletê Kurd rabû ye ser pîya. Bi dengekî bilind gazî kirin em hene û em ê her tim jî heb in. Di servan bûyarên pîroz re 15 sal derbas bûn.  (foto Serhilna Dersim, Bedîrxan, Şêx Saît û Zîlan)

Berê digotin terorîst in. Îro dibêjine milîtanên Kurd, milîtanê PKK e. Ew îro li her dera


Şaki Seyit Rızanın ele geçirilmesi artık bir gün meselesidir

Çapulcular Teslim Oldular

Tuncelinde Madenler Keşfedildi




Şêx Ali Riza, İhsan Nuri, Xorşit, Fehmi Liceli



Tirkiye yê û Kurdistanê wekî yek şêra belav bûne. Ji Bakûr da bigire hetanî Başûr, ji Behra reş bigire hetanî Behra sipî. Li Qeyseriyê, Toqatê, li Denizliyê, li Sêwazê 400 kilo meter nêzika paytexta Roma reş Ankerê. Nezika meclîsa faşista.
15 tebaxê ji bo me Kurda mîlada Kurd e. Xelasiya gelê Kurd e. Azadiya gelê Kurd e.

Spas spas hezar carî spasî ji wan û ji serokê hêja Apo re.

Bijî Apo




Bijî Mazlum
Bijî Kemal, Hayrî
Bijî Mahsum Korkmaz.
Bimire Şemdîn Sakik û hevalên wî ye wek wî.
Bimire îxanet û teslimiyet.
Serokê birêz wan rojana wiha analîz dike:


1- Em bi salan li ser rastiya şer sekinin, ka şer ji bo me pêwîsta an na?.
2- Şerekî çawa yî li hembera dijmin em bikin û şerekî bi kîjan qerektere, yê me bibe ser rastiya me?.
3- Şerekî daimî û an lêxî û birevî pişt re dijmin bê te îmha bike. Şerekî bi vê avayê me nabe ser serxwebûn azadiya me.
4- Em xwe çawa hazir bikin? Çawa praktika xwe bi kar bînin? Em ê çawa dijmin di bin lepên xwe kin. Em bi wan pirsan û bi gelek hevalan ve bi salan li ser xebitîn û serê xwe pê re êşand. Li dawiye hemû heval gehştin ser encameke. Şer ji me re wekî nan û av pêwistê. Bêşer ve kara naçe serî.

Xala ma didya Qerekter û şehsiyeta gelê Kurd bû.
1- Gelekî ewqas salin di bin zor û zûlme û ji kesaniyeta xwe dûr, ji zimanê xwe dûr, ji kultura xwe millî bi dûr ketî, em ê çawa wî gelî li şer bi kar bînin û çawa ji wan Fedê bigir in?.
Ew xalan hemû me yek û yek di ber çavan re bi kurtayî derbas kirin.
Em li ser real Sosyalizme xebit in. Xelasiya wî gelî, me di sosyalîzme de dît. Me **şerê** Vîyetnanmê û şerê Afganistane ku li hembera Rusa kirî da ber çavên xwe.
Hêza dijmin me tahlîl kir.
Em bi hevalên xwe ve dîroka gelê Kurd û qerektera ku şerê wan li hembera Kurda kirî. Em bi hevalên ve li ba eşîra û serokên eşîra man, me ew tahlîl û analîzê wan kirin. Me 28 serhîldan bi kurahî tehlîl kirin û ducar sê car xwandin û di ber çavan re derbas kirin.

Însanê Kurd çiqas qapasîta xwe şer kirine heye û ê şer bike.
Ji wan tahlîlna şûnda em bi mehan li
ser serokatiyeka pir bi hêz sekinîn. Serokekî bi şahsiyet û ji kesanatiya xwe tu tawiza ne de, sekinin. Ne serokekî ku çentê bixîne destê xwe û bajar bi bajar, dewlet bi dewlet biger e. Gerîla li serê çiya ew li metrepola me ew bi zimanekî tûj red kir.
Serokekî di nav refên xwe da, di nav gel da û derd û kulê gelê xwe bizane û bi wan re hevpar bibe gerîn. Hevala bi tevayî gehştin encameke û gotin ew şert û şurt li cem Birêz Apo mevcud in. Bi tevayî ez hatim hilbijartine.
Em li ser tiştekî dinî pir pêwist sekînin. Me bi salan di nav hev de şer kirî û çima? Ew bersiva serok hema da û got, Dijmin bi salan xaîn provaqator xistin nav me, me ji bo wê şer hev dikir. Dijmin hetanî roja îro jî di nav me dan e.
Me hema H.R.K. hêza Rizgariya Kurd awa kir û pişt re me A.R.G.K Arteşa rizgariya



gelê Kurd awa kir. Gava ku me wan kirin bi hezaran kes û bi dehan partiyên Bakûr û Başûr ew tiştên ku me kirî bi çûk dîtin. Gava ku me dest bi 15 tebaxê kir. Deng him ji dewlete him jî belangazên me ku li metrepolê Ewrûpa dijîn derket û gotin wiha nabe. Ew macaracîne. Ew terorîst in. Ew bi dijmin re kar dikin. Ew dijmin hîng jî har dikin dişînin ser me.
Dewleta tirk dewleteka pir bi hêz e. 800,000 eskerî xwe top û tivingê xwe hene. Ew bi dewleta Tirk û ordiya Tirk re baş nakin. Ew "dergûşa" zû hatiye xwedê dane. Dergûşak zû hatî xwadê dane, temene wê dergûşê jî kurt be. Bi hezaran kesî li ser me îxanetî û îhbar kirin. Bi dewletên dijminan re ketin nav peymanên bi dizî. Kîjan qirêj li ku bû di avêtin ser me. Wan felsefeka wiha dikirin, qirêje bavejê, eger negire jî şopa xwe bimîn e. Me li hembera ordiya ku wan birî bi ezanan têxistî me bi tenê şer kir.
Ne tenê li hembera dewleta Roma reş. Li hembera dewletên Ewrûpa. Bi taybetî jî li hembera Almanya û Fransa, Îngîlter e. Nizanim wan belangazên me qot qul çi dibêjine îro?.
H.R.K îro bûyê ARGK e. Bi hezaran Gerîlayên xwe hene. Bi milyonan milîsê xwe



hene. Bi sedan saziyên xwe fermî hene. PKDW heye.
Mala Kurda dengê Kurda MED tv heye. Hîng jî yên bibin. Îro dewleta tirk şaş bûye çawayî dengê MED tv e bigire, geh pera dide, geh bertîlê dide, geh sînyala dişîne bername MED tv e asteng bikin.
Ew îro bi siyonîstan ve tev hev kar dikine. Tirsa xwe gihandiye Îsraîlê faşist. Îro heza me ji ya duh bi deh qatan hîng xortire.
Ehmedê Xanî wiha gotibû;
*«Heza me wek Nîl e, lê em Ferat û Dicle ne»*.
Hz Mevalana Celledin-i Romî gotineka xwe heye. *« Em wekî umman in(okyanus), çiqas ava laxamê/gemar biheriqe ser me jî, em ê ewqas paqij bibin.»*



Gerîla dibêje; "Îro me li Başûr û Bakûr û rojava kok daye, em ê hîng jî şer bikin».
Hevala Zîlan, panzde salan dijmin bi hovitiyeka mezin hat ser me. Li ser rûyê dinya yê çi xerabî, çi neçêtî hebûn li ser me kir. Gundiyên me li şûna kobî (aletên ku li maînan digerin) bi kar anîn. Malên me şewitandin,

gundên me weran kirin. Bi sed hezaran xort û keçên me avêtin zindanan. Goştê keçên me bedew genî bû di zîndanên dijmin da. Dîwarên zîndana bi hestiye xort û keçên me hatin çêkirine. Dar û daristan, heyvanên bêzar û ziman şewitand in. Ez nizanim wan ji wan daristanên ku tabiata dixemlînin û ji ezmanan da baranê tînin xare çi xwast in.

Hevala Zîlan, Hitler ji Yahudiya xêr bû ?
Musolin ji Îtalyan xêr bû ?
Franoko ji Îspanyoa xer bû?
Roma reş ji Ermeniya û Kurdan xêr bû?
Ew li xalekê dighêjin hev.
Ew Faşist in, Xwîn xwarin, har in, hov in.
Hevala Zîlan, !

Bilançoya 14 sala wiha ye.
1)-15 Tabax 1984- 15 Tebax 1988.
Çalakiyên ku bûyî 2050. Wendaye TC 5830, Şehîd 279
2)-15 Tabax 1988- 15 Tebax 1989.
Çalakiyên ku bûyî 358, wendaye TC 1131, Şehîd 65.
3)-15 Tabax 1989- 15 Tebax 1990.
Çalakiyên ku bûyî 289, wendaye TC 1501, şehîd 126.
4)-15 Tabax 1990- 15 Tebax 1991
Çalakiyên ku bûyî 914 wendaye TC 2411, şehîd 194.
5)- 15 Tebax 1991 - 1 çile 1993
Çalakiyên ku bûyî 1367, wendaye TC 1879, şehîd 832
6)-1 Çile 1993- 1 çile 1994.
Çalakiyên ku bûyî 3173, wendaye TC 1879, şehîd 808.
7)- 1 Çile 1994-24 Hezîran 1994
Çalakiyên ku bûyî 1920, wendaye TC 3302, şehîd 729
8)- 24 Hezîran 1994- 30 Tîrmeh
Çalakiyên ku bûyî 3349 wendaye TC 10834, şehîd 1450
9)- 1 Tebax 1995 - 30 Tîrmeh 1996(1 kanun hetanî 15 kanune ne daihle)
Çalakiyên ku bûyî 1016 wendaye TC 2311, şehîd 441 û wendaye PDK 1879
10)-15 Tebaxê 1996- 15 Rebaxê 1997.
Çalakiyên ku bûyî 1934 wendaye TC 4465, wendaye, şehîd 818 PDK 1182
11)- 15 Tebaxê 1997- 9 Tebaxê 1998
Çalakiyên ku bûyî 1904 wendaye TC 2458, şehîd 937, wendaye PDK 2254
15 Tebaxe ne tenê ji bo me roja xelasiyê. Rebbê Alem vê rojê 15 tabax 1927 an Fidel Qastro jî pêşkeşî gelê Kuba kir.
Li panzde tebaxê 1945 an li Viyetnamê Hoşîmin bi hevalên xwe ve şer li hembera Amerîka û hevkarên wan îlankir. Ameriqa ji ser axa xwe paqij kirin.
Şervanên me jî qirêja li ser Coxrafiya me paqij dikine.
Bi ser bilindiyeke. Bi dilekî saf û tazî dest bi şer kirin. Niha ew eşqa wan welat der û dore welat dijî kirine.
Dilê xort û keça bi eşqa wan dikele. Dijmin li ber xwe kirine mişke Yemanê. Niha ji zûda bû ku me perçek ji welate xwe azad bikira.
Lê xaînên me wekî Şemdîn, xwe firoşên me, cahşên me, kûçikên me ku hestiyê wan

wediroj in, serok eşîrên me kevne perest, li lingên me bûn bela. Di nav me da jî ne hendik bûn.
Ez gotineka Hz Mihemed ji te re bibêjim Rojeka wiha dibêje bi hevalên xwe re
-Hevalno va çiye? Em wan peykerna(put) her roj bi şev dixelînin, em sibê radibin peyker dîsa wekî bere li cîyê xwe ne.
-Ebû Bekir ji wî re wiha dibêje.;-Ya Mihemed ewil li dorpaş xwe binêre, di nav me da xaîn pir in. Divê tu wan paqij bikî.




-Mihemed jî dibêje Ya Ebû Bekir tu rast dibêje. Ma ew jî goreva we be.
Hevala Zîlan û Sema û Leyla! We tirseka pir mezin xistiye dilê dijmin. Ji we û ji hevalên we pir ditirsin !
Ji xwendevanên me ditirsin !.
Ji sebiyên me ditirsin!.
Niha jî ji karkerên me ditirsin e!. Karkerên me belangaze ji bo du quruşa qezenç bikin, dev û didan li wan zûwa bûyî ditirsin e. Hersal karkerên me diçin Edenê û Stenbolê û Behra reş findiqa berhev dikin. Lê îsal Ordu, Tokat, Giresun ji wan re, ew herêma qedexe kirin. Gotin hûn ne karkerên normal in. «Ew qadroyên PKK e ne. Ew diçin wir probagande dikin». Niha jî li serê karkerên me vîze derxistine. Eger tu herî wan derna tu mecburiyî vîze bistînî ji waliye herêmê yî faşist. Ewê hîng pir tiştî li serî me derxînin.
Kanî em birayên hev bûn?.
Ka em jî wekî Tirkan dihatin hesibandine!.
Derew û vira bitir tiştî wan tune.

Hevala Zîlan, Ez ji te re qala ramanên ronekbirekî tirkî bi salan li Amerîka Tirkiyê temsîl kirî bikim ( Şukrî Elekdax) Ew aynî zamanin de ber devke dewletê jî.



1-Ew wiha dibêje; «Pirsa Kurdî divê em di demeka kurta çareserbikin. Eger ku em nekin. PKK e û li Ewrûpa û Ameriqa bi hêzeka pir mezin bilind dibin. Ew pir caran diplomasiya me asteng dikin. Nunerên Ewrûpa û Amerîka ji me pirtir wan guhdar dikin.
2-Êdî li ser çiyan şer tu kesî têr nake. Divê em tiştên din bikin
3- Pirsa Kurdî di demeka nêzîk da bibe pirseka siyasî êdî em pêşiye negir in.
4- Panzde salin ku me navê vê pirse kiriye Guney doğu Anadolu. Divê em êdî navî pirse rast bikin.
Em Kurdistane bi 300,000 esker diparez in. Gava ku em ji wir hêzên xwe bikşînin, ya ku bê serê me, kes nizane hesab bike. Ew PKK e êdî bûye ordu
5-Karê ewilî ku em bikin, em Abdullah Öcalan bikûjin. Kûştina wî şert e.
6- Bi Suryê re şer bikin.
7- Ya herî pêwîst jî Suryê bi Îsraîlê bidin tehdît kirine ( çavtirsiyeke bidin Suryê)
Eger ku em wan nekin. Serokê PKK e wekî dêwekî ku di feqekê daye, di paranga ya de hatiye girêdan. Eger ew ji feqê bifilte ye him me bixwe û him jî we.
Hevalên delal; ez ji we dipirsim Terorîst kiye? PKK e an dewleta Tirkiyê.? Elbete Roma reş û hevkarên wan nin.
Îro meha tîrmeh e. Şer ne li Kurdistane tenê hey. Eskerên Roma reş li Behra reş ji bo

ku karkerên Kurd nekin wê herêmê bi hezran eskerên xwe seferber kirine. Ew ne karker bûne, ew terorîstê PKK e ne.



Tîrmeh meheka pir germ e û germ jî derbas dibe. Him ji aliyê şer ve, him ji aliye tave da. Li Ameriqa û li Qesra sipî germaye li serê Bill Cilinton xistiye. Xwastiye xwe sar bike, bîhna xwe tozkeke bigire û xwe negirtiye tecavûza keçeka Amerîqî bi navê Monîka Lewîskî kiriye. Wekî cardavanên me tên keç û bûkên me dibin û wan bi zore îxfal dikin. Bill Cilinton jî Qesra sipî wiha kiriye. Ji bo ku sere wê bûyarê bigire hema balfîr rakirin û Sudan û Afganîstan Bombe kirin. Bi sedan kesên bêsuç û zar û zeç hat kuştin.

Hevala Zîlan, Îro 28 Tîrmehê 1998 a ye.

Serokê birêz Öcalan îro dîsa di MED tv e da axifî. Got; «Em dîsa destê xwe yî biratî û dostaniye dirêşa dewleta Tirk dikin. Ma merivatî li ser piyê me bimîn e. Em ji yeke



îlonê 1998 an agirbesteka yekalî îlan bikin.
Bes e êdî ma ne dayik kurd û ne jî ên Tirk negirîn.
Bes e êdî ma li dewsa hêstirkên rûyê dayîkan eşq bibare. Herdu aliyan jî bi deh hezaran şehîd dan.
Ew ne ewlede Tansu Çiler û Mesût Yılmaz in. Ew ewledê feqir û belengaza ne. Dewsa şer biratî û dostanî bigire
Em hezar sala ku bi hev re dijîn û di komara Tirkiyê de xerce me û keda me jî heye.
Bes e êdî li ber deriya nalîn.
Bes e êdî di konên reş da jiyan
Bes e êdî ji dewlemendaran re dergevanî
Wa hezar sala ku em destê xwe yî aşitî û dostaniye dirêşa we dikin. Me li rojên we tarî xwe da kêleka we. We em avêtin girtingehên xwe genî û we li meydanên Amedê kalên me rîh sipî bi darda kirin. Hûn bi vê jî neman, we em ji gundên me derxistin. We gundên me talan û weran kirin. Em li xeribiyê bûn xulam û kolê we. Em wan rûreşî û bextreşiya ku we li me kirî, me bi kefê destê xwe weda kir.Werin em her tiştekî ji nûva bi hev re parva bikin.
Min li sala 1993. 03. 17 an da jî destê xwe yî dostanî û aşitiye dirêşa we kir. We qebul nekir.
We bi hemû hêzên xwe ajote ser me. We got; PKK e qedyayê ji bo wê agirbeste îlan dike.
We Şemdîn Sakik kire devre û 33 eskerên belangaz kuşt in. Ez bi we re dibêjim, warin ji vê eşqê xwe ya şer vegerin. Em PKK e hêzeka mezinin. Keçên me bese xwa ordiya we ne. Lê em mecbur man ma dîsa dest bi şer kir. Kê wenda kir? weeeee wenda kir!. Ez îro dibêjim war in em tev hev wekî bira bijîn. Xwe nexapînin»
Hevala Zîlan, Ew destê dirêş kirina birêz Öcalan, him li Ewrûpa him jî li avahiyên Tirkiyê sivil ve pir alaqa baş dît. Lê, şer xwaz û xêr nexwaz di dewrê dane ji bo şer.

Hevala Zîlan, îro 31. 08 1998 a ye.



Sibê roja aşitiya cîhanê ye. Ji bo aşitî û biratiyê vê sibê bi dehan Otobus ji Stanbolê berva Amedê bi rê ketin. Wan xwastin li Amedê paytexte hevdu bibînin. Ez nizanim Roma reş destûrê bide an nede wan. Sala çûnî jî tirêna aşitiye bi rê ketibû. Ne Almana û ne jî Tirkan rê da wan. Li welatê Roma reş hemû di copan re derbas kirin.

Hevala Zîlan, Wekî hûn jî dizanin gava li ciyekî şer dest pê dike. Bi piranî zarok û jin, ji wî şerî zerare dibînin. Gava ku li Bosnaya şer dest pê kir bi sed û dused hezaran jin û zarok mirin û destê xwe direşa namusa wan kirin. Îro li welate me jî ew rûreşiya dibine. Eskerên dewleta Tirk tên gundên me keç û bûkên me ji ber derîyên me direvînin, bi rojan wan di qereqolên xwe de digirin û heqeretên pir mezin li wan dikin. Ew kul a kula salane, lê tu kes li nava xwe nagire û destê xwe yî merivatiye dirêşa wan bike.

Avuqat Eren Keskin, Jutha Hermes û Fatma Karaş bi du sê hevalên xwe din ve biryare digirin ku buroyeka wiha vekin û alikariya jinên ku lê neheqî û lê heqeretî hatî kirine alîkariya wan bikin.




Gava ku jinên me Kurdistanî bihîstin û ciyekî wiha ji wan hatiye vekirine, di rojekê de 66 jinan serî lêdan. Ji wan jina 43 Kurd bûn. 17 Tirk û 4 Romen û yek Alman Eva Juhnke bû. Pir ji wan bi destê Koruciyan heqeret û rûreşî li wan hatibûn kirine.

Ez ji te re bi kurtayî qala kecekê bikim ka çi hatiye serê wê belangaze.



M.F keçeka 17 sal bû. Hîng di bihara jiyana xwe da dijî. Wê jî wekî her keçekê dixwast bizewice û mirazên xwe li ser rûyê vê dinya yê bibîne û bibe xwedî mal û xwedî zaro. Lê dijmin û xwînxar ew mirazê wê belangazê di çavên wê de hîşt. Destên xwe hine nedîn. Xêliya bûkanî li xwe nakir. Ji ber ku ew êdî jinebiye. Wekî hûn jî dizanin gava ku tiştên wiha hatin serê keçên me êdî ew keça nîv mirî tên hesab kirin. Para wan ya hewî, yan jî sêwî ne. M.F di sala 1994 an da tê girtin. Heyşt roj û heyşt şeva lêdanên mezin lê dibin. Vê carê jî di feleqe re derbas dikin heyşt roja birçî, tî û tazî di nav qereqolda digerînin. Dûre wî dikin hundire lastîka tomofîlê li arazyeka dûz wê tilût dikin û hiş û aqil li serê wê namîn e. Bi vê rûreşiye jî namen. Tên kortekê dikolinin û wê tînin davêjin û bi we re dibêjin em ê te bikujin, ev tirba te ye. M.F li ber wan digere û li ser wan diger dibêje tu suçî min tune. Ez ne endame PKK e me. Li we derê eskerek tecavûza wê dike. Ew li wir bîrva diçe û dikin nav betaniyeke û wê tînin davêjin nezarate. Du sal nîv ceza didin wê. Ew cezayê xwe dikişîne ji girtîngehe der tê û tê li Stanbulê bi cîh dibe. Polisê faşist wê li wir jî rehet bernadin. Yanzde roja di îşkence û lêdane re derbas dikin wê. Dîsa wê dişînin dadgahê, dadigeha faşist wê dişîne girtîngeha Gebzê. Gava ku ew ji girtîngeha Gebzê derdikeve serî li vê buroye têxe û ew bûyarên ku di serê wê re derbas buyî hemûya ji wan re dibêje. Ew ji di nav xwe de

biryareke distînin wê dişînin Ewrûpa ji bo tedaviyê. M.F niha li Ewrûpa di nexwaşxane da tedawiyê dibîn e.
Ez niha baş dizanim û fem dikim keçên Seîd Riza û keçên Apo çima xwe ji zinaran da davêjin nava newala. Newal ji xwe re kirin goristan. Wan wiha gotin: "Newalên me ji girtîngehên wan faşistan tim baştir in".

Îro 01.09.1998 na e.

Yekê îlone roja aşitiya cîhane yê. Lê, Roma reş teva wê cîhanê tune ye. Cîhana wan



cuda ye.Ti kes wan ji cîranitiye ji nahesibîne. Ew suçdar in. Koka Ermeniya anin, Ereb ji nav xwe bi darê zorê derxistin, li hembera gelê Balkanan bi salan şer kirin, Rum bi behrê de berdan, xwastin koka me jî bînin lê bi şûnekirin.

Topal Osman li şerê Dêrsîmê wiha gotibû; «Me koka yên ku dibêjin zo anîn , em niha



koka yên ku dibêjin lo bînin». Rom bi ser wan rûreşî û bextreşiyan da dibêjin derdorên me bi dijminan hatiye pêçandine. Zanekî Rus diçe dêr(kilisê) li ber Xwedê digere û dibêje «Xwedêo tu min ji şerê Romê reş û ji şerê şeytanan biparezî»

Hevala Zîlan û Sema; Tiştên ku sibê bê serê me, em ji êvarê de dizanin. Min li roja yekê îlonê ji we re gotibû , heval û dostên me di bin serokatiya
IHD Komela mafê mirovan ji Stanbolê herin Amedê.



Roja yekê îlonê li wir pîroz bikine.
Lê wekî sala 1997 an Tirêna ji Almanya bi rê ketî nekirin ku di Tirkiyê kevin.
Dewelta Roma reş heval û dostên me vê carê jî nekirin Amed ê. Dewleta Roma reş li vê rojê 122 hevalên me girtin bin çava. Amed ji bo ku wan heval û dostên me bike, bajarê Amedê vala bû. Lê dewletê destûr neda wan ku di nava bajer kevin. Ew naxwazin ma aşitî bê welatê me. Ji şer berjevendiyê wan hene. (Foto Eren Keskîn)

*Ez ji we re qala yekê îlonê bikim.
Çima yek ê îlonê kirin roja aşitiya cîhan e. Di şerê cîhaneyî yekemîn de, bi sed




hezaran zarok bi milyonan jin û mêr hatin kuştin e. Di vî şerî de 50 milyon kesên bêsuç hatin kuştin. Bi sed milyonan kes birîndar bûn. Di sala 1933 an Adolf Hîttler hate ser hikûm. Di aynî sal de Hitler êrîşa ser Polanya kir û Polanya zept kir.
Amerîka di sal 1946 an da roja yekê îlonê wek roja aşitiya cîhane îlan kir.
Amerîka bi xwe ji di 6 tebaxê 1945 Hiroşîma bombe kir. Di **9 tebaxê 1945** an da Nagazakî bombe kir û bi hezaran kes mir. Amerîka xwast bi îlan kirina vê rojê çavê cîhanê boyax bike û xwe dera paqijiyê xwe. Ji bo ve ew roja kirin roja aşitiya cîhanê.

Hevala Zîlan û Sema, îro yekê îlon e.

Îro gelê Libya sîh saliya serokê xwe birêz Muamer Qedefî pîroz dikin. Bi sedan dewlet û serok dewlet beşdara vê pîrozbihaye bûn. Partiya me PKK jî bi awakî fermî li ser navê PKDW Yaşar Kaya cîyê xwe li nav wan serok dewletan dinya yê girt. Gava ku Roma reş bîhst ku Kurd jî dewet wê pîrozbahiyê kirine, serokê Libya Kadafî protosto kirin. Gotin; Kadaffî mirovekî dîn e, terorîst e. Ev nizanê ku çi bike. Bi lez û bez balyozxana xwe ji Lîbya kişandin. Nota li ser note dan Libyayê.



Qedefî di axaftina xwe de wiha got; «Kurd ji aliyê tirkan ve bi xençerê kor tên serjêkirne, deng ji mislimana dernakeve!

Çima ?

Kurd jî mislimanin. Bila ma ew jî di bin vê roja germa pîroz da ciye xwe bigirin. Ew îro li nav me ne. Em bi wan serbilind in».

Em ji birêz Qadafî re spas dikin.

Hevalên delal; xwendevanên me ji bo wî mêrxazî hindik agahiyê xwe hene.

Ez dixwazim bi kurta yî ji we re qala Muamer Qadafî bikim. Qadefî kîyê?

**Qedefî** li Sîtê û Sabahye di sala 1942 an da hatiye xwedê dane. Dê û bavên wî goçeber Berbarî bûn. Ji aliyekî Libya bara aliyekî din dikirin wek me Kurda. Di sala 1911 an gava Libya ji aliyê Îtalyan ve hat dagir kirin. Bavê xwe ji aliyê Îtalyan ve hat kuştin e. Li wê deme Qadafî hê xort bû. Li hembera dijmin dest bi şer kir. Pir caran avêtin girtingehê. Xwendina xwe orte û lise li Sabahe qedand. Di sala 1963 an ûnîversite qedand û dû re kete mekteba Eskeriyê bilind. Di sala 1965 an de ew meketeba eskeriyê bi serfiraziyeka mezin qedand û Mamostê wî bi wî re wiha digot. «Ew agire, Ereba ye». Ew ji aliyê dost û hevalên xwe ve pir tê hezkirin. Ew di demeka nêzîk da hemû heval û dostên xwe nêzîka xwe dike û bala wan dikşîne ser xwe. Ew bi wî pir bawer dikin. Ew bi hevalan xwe re dibêje; wext derenge, dibê em bi şev û roj kar bikin. Gelê xwe ji bin destên wan faşistan xelas bikin. Di sala 1965 an roleka mezin dilêze û Qiral Îdsris ji hikum têxîne. Rewşa politiqa Libya ji binva tê guherandin. Qadafî bi vê çalakiya xwe, bala hemû Ereba kişand ser xwe. Nav û dengê wî giran giran li nav xort û keçên Ereb belav bû. Ji cîhana Ereban xort Ereb ref bi ref dihatin cem wî. Di sala 1970 an de hemû avahiyên Amerîka û Îngilterê eskerî girtin û leşkerên wan şandin. Got; ev dera «Erebîstane», ne welatê Amerîka Û Îngilistan e. Li sala 1973 an hemû bîrên petrol û Îstesyonên petrola xistin bin sîwana dewletê û ew kirin malê dewleteyî netewî.




Ew petrola Xwedê daye Ereba. Negotiye ma Amerîka û Îngilterê û Îtalya bên bixwin. Di sala 1976 an de Navê Libya kir Komara gelê Libya Sosyalîst. Gava ku wî ew guhertina çê kirin ar û pêtî bi Amerîka û Ewrûpa ket. Ameriqa û Ewrûpa Ambarga danîn ser Libya ye. Ew Ambargoya deh sala ajot. Mêzekirin ku ambargo tu awilê ji Qedefî û gelê Libya nake. Di sala 1986 an ji keştiyên Filo, Libya bombe kir. Trablusgarb, Bîngazî dan ber bomba. Bi sedan kesen sivîl mirin. Di nav wan sivîlan da

keça Qedefiya manevî jî hebû. Qedefî bi xwe bê birîn xelas bibû. Heta roja îro jî Ew Ambargo  li ser gelê Libya didome.

Îro 2 îlon e.

Paytexta Roma reş mêvanekî xwe yî pir qedir bilind îro pêşwazî dike. Mesût Berzanî



û Berdevkê wî Samî Abdullrehman. Rojname Tirkan îro Hurriyetê wiha nivîsiye: «Dostê gelê tirk Mesût û bi qadroyên xwe ve îro tên Ankerê. Mesût merivekî dewletê ye. Merivekî pir giran e. xwastekên me yeke nake didu».
Va qirara pênce sala yê tu kesî qimet nedaye Kurdan, çima îro ewqas qimete didin wî nizanim? Berê gava ku Kurdek dihat cîyekî, ya dişandin hotelek sınıfa 4-5 an, an jî li ba hevalên wan dikirin mêvan. Tu kesî qimet nedida wan. Elbet bi vê hatina nunerên Başûra a fermî tiştekî heye.
Li yekê îlonê serokê birêz Apo agirbest îlan kir. Ew hatin vir eceba çawa agirbestê îhlal bikin?! Roma reş ji xwîna me têr nebû. Mesût û hevalên wî hê ji derewên Romê reş têr nabûne.
Hevala Zîlan Gava ku min wan rezana ji te re dinivîsandin Mam Celal jî haziriya xwe ya Amerîka dikir. Malê Xwedê ava be, yek li Anqerê, yek li Amerîka. Ji bîrnekê soytariyên me li Anqerê jî Mesût bi têne cîh nehîşt bûn. Hûn li kê digerîn, ew hebû. Kurdistan is for sale. Any body don"t întrestîng, their întresting just fo oil. Lê tu kes nastîne Kurdistan e.
Mesût nizanim em bi te re çi bêjin.
Helbestvane mezin Namî di daxwaznama xwe ku li ser Mele Mistefê wiha nivîsandibû.

*" Pêşmergê bijî bi serfirazî*
*Lawanê welat şehîd û gazî*
*Bijî Mistefa bi navê xanî*
*Qehremanê Kurd bijî Berzanî"*

Ez nizanim eger Namî xweş li heyte bûya, li ser Mesût çiyê binivîsanda?
Planên wan hertim bi dizî û wiha ne; em ê çawa koka PKK bînin?. Em ê çawa PKK ji Başûr bi derxînin?
Başûr û Bakûr welata me ye. Em li ser axa xwe ne. Birêz Öcalan dibêje; «Tu hêz û quvet me ji ser axa me dernexîne. Em yên ku me ji ser axa me bajon murade wan di qursaxa wan da bînin»
Hevala delal; Mirovekî karkir û şoferê taksîye. Li bajarê Îzmîrê Qedifê Kalê agir berda bedena xwe û xwe şewitand. Gava ku agir berda bedena xwe bi qîrîn û hawa gazî kir «*Bijî Apo û bijî PKK û bijî şervanên serê çiya, di nav ar û pêtiye de bedena xwe bêrih ma*».
Vasfî Karakoç. Vasfî li Îzmirê dijî jiyana xwe bi şoferitiye dike. Dewleta Roma reş




dizanin ew welatparêz e. Rojekê tên sekoneka taksiye û wî digirin bin çava û bi wî re dibêjin tu ê ji me re bibêjî ka li Qedîfê Kalê kî Apoci ye û kî ne Apocî ye. Ew ji wan re tu tiştî nabêje. Polisên faşist wî di îşkencan re derbas dikin.
Lê, ew vê carê biryara xwe dide eger polîs dîsa bên min bibin û ajaniye teklifa min bikin, ez ê vê carê li qereqol xwe ji bo serok û partiyê xwe bişewtînim yan jî xwe di dilê wan da biteqînim. Wekî Mehmet Çimen û Ez jî birayê Rehşan Demir im.

Ez xalîya ji ber Mehmed Çimen û Rehşanê ma me.

Îro 4 îlon e.

Îro Şemdîn dera ber dedagahê xistin. Parêzgerên wî ew neparaztin. Wiha gotin: «Çi heye ku em çi biparêzin. Xaînan xaînê biparêzin».



Şemdîn li dadgahe wiha got;

1- Min pir caran bi Apo re got: Bes e êdî em bi şer di tu deran nagihêjin. Gerege ku em dawiyê li wî şerî ku bira û birê dikûjê bînin. Apo ew pêşniyaziya min qebul nekir.

2- Gerege ku em îdolojiya xwe nerm bikin û dev ji Sosyalîzme berdin. Qebul nekir.

3- Min go, bes e êdî em tu kesî sêwî û perîşan cîh nîni. Qebul nekir.


4- Min di nava partiyê de pir şer da û ez li ser piyên xwe sekinim.

5- Lê Mesût Berzanî em firot in. (Ew gotina ji dev wî filitî)

Niha gelê Kurd bi wî henekên xwe dike û bi wî re dibêjin;
rojbaş Şemdin!
Sebah û el xeyr Şemdîn!
Goodmorning Şemdîn!
Beyanî baş Şemdîn!
Tu niha pê hesyayî ku Mesût Berzanî tu firotî. Mesût Barazanî baş kiriye tu firotî. Li welatî me heqe xaînan qurşuneke.

Îro 5 îlone 1998 e.

PKDW Parlamentoya ma derwayî welat îro hilbijartina xwe çêkir. 65 kesên qedir giran û bi rûmet hatin hilbijartine. Ew Parlamento li gelê me pîroz be. Û em ji wan re serkeftin dixwaz in. Serok dîsa **Yaşar Kaya** hat hilbijartine. Lê vê carê pir bi deng bû. Wekî hûn jî dizanin Parlamentoya ewil 12 nîsan 1995 an li Holanda, li bajare Lahey e hat demizirandine.



îro 9 îlone 1998 a ye.

Li sala 1984 an îro lawekî Kurd li xerîbiye û li Parîsê mir. Ew ji aliyê her Kurdekî û her Tirkekî ve baş dihat naskirin. Heta ew ji aliyê biyaniya ve jî tê naskirine. Yılmaz Güney. Wi mêrxwazî berî ku here ser dilovaniya xwe wiha got;



*«Felek te mirazê min di çavê min da hîşt. Di dilê min de her tim filmekî ji bo têkoşîna gelê Kurd hebû ku ez çêkim, lê ne bû nesîb. Ez bi êş û kedera wan mezin bûm. Gava ku mala me li Edenê bû. Min karker û xizanên Kurd di rewşeka pir xirab da didîtin. Kezeba min li hembera wan qûl dibû».*

Ew jî li kêleka Qasimulo û hevalên din bin ax kirin.

îro 12 îlon e 1998 a ye.

Îro hevalên me festîvala xwe şeşemîn li welatê Holanda bi darxist in. Bi sed hezar welatparêz beşdara wê festivalê bûn. Hemûya bi devekî gotin: ”Bijî Apo û bijî hevala Sema. Heval Sema namir in!” Hetanî ku em hene Sema jî hebe.
Tişte di vê festîvale da bala meriva dikşandî Ala Kurdistane ji 30 metro yî bû. Pişt wê Ala partiyê, ERNK ji 30 metro yî dihat. Bi disiplîneka mezin bi merisîmek çê kirin.



Hevala Sema! Gava ku xwarziyê Musê Enter Hûseyin Deniz ji aliyê qontir Gerîla va hat kuştine. Apê Musa wiha got; *«Lawê min tu nemirî. Tu li ser axa welatî xwe şehîd ketî. Lavê min xweskek ez jî wekî te li ser axa welatê xwe şehîd bibim. Ew ji bo min şerefeka mezin e.”* Li vê rojê, ev jî ji aliyê qontirGerîla ve li Amdê hat kuştine û şehîd bû.

îro 15 îlon e.

Di ser agirbesta ku serokê hêja Abdullah Öcalan îlan kirî re du hefte derbas bûn. Deng ji kevira derdikeve ji Roma reş dernakeve. Operasyonên xwe hê bi hêzeka pir mezin didomîn.

Birêz Öcalan ji bo agirbeste wiha got; « Ew agirbesta bi daxwaza rêvebirên Roma reş hat îlan kirine. Ne ku ji aliyê min ve hatiye îlan kirine. Wan xwast min jî îlan kir». Serok va daxuyaniya ji bo agirbestê mehek din şûnda aşkere kir. «Wan xwast min îlan kir. Ew nedaxwaziya min bû. Li Ewrûpa çend caran berdevke xwe şandin û bi hevalên me re hevpeyvîn bi darxistin. Îro jî dibêje agir best tenê ne bes e xwe. Divê Apo ji çekan jî dest berde û bê teslim bibe wekî Şemdîn». Hukmata me hukmateka sernerm û serwexte. Serokê birêz di MED tv e da axifî û wiha got; «Ew sebra me Taşimîş dikin/diceribînin. Ew bi me dilîzine. Ev agir besta ku me îlan kirî, ew dixwazine em bixwe îhlal bikin. Em li ser şor û gotinên xwe nî. Ji aliyê me ve qurşuneka bi tenê jî nayê avêtine».



Hevala Zîlan û Sema, serokê ÎRA Şîn Fehn got; «Em agir besta ku ji aliyê PKK va hatî îlan kirine bi dil û can destek dikin û piştgiriya serok Apo dikin. Gava ku me destê xwe yî biratî û dostaniye direşa Îngilîza dikir wan jî bi me re digotin hûn terorîstin em bi terorîstan re li mase rûnanin. Hûn dijmine gelê me ne digotin. Lê çi bû li dawiye. Ew îro li hembera me mehçup û stû xar in. Ji me şerm dikine. Ew sebebe wî şerî bûn. Wan bi xwe şer dirêj kirin. Wan tenezûl nedikirin ku bi me re li mase rûnin. Em biçûk ditîn. Ez ji sedî sed bawer im rojekê ew ê bên ji gelê Kurd biborîna xwe bixwazin».



îro 16 îlonê 1998 a ye.

Li vê rojê îro di nav bera gerîlayên Îhsan Nûrî Paşa û Romê reş da şer dest pê kiri bû.



Li vê rojê agir ji ezmanên Xwedê de li ser Gelê Arartê dibarî. Gelê Araratê bi mêrxazî li hembera dijmine xwe şer kirin. Hûskoyê biroyê Têlî Ji mêwziyekê derbasa mêwziya din dibû. Wan mêrxazan li ser serê Çiyayê Arartê Komela Xoybûn saz kiri bûn. Û bi mêrxazî şehît ketin û qurşuna xwe dawiyê ji xwe re veşartibûn. Ne wek Şemo û xaînên me din xwe firotin dijmin. Wan mêrxazan di nav hevda bi axa Aratê sond xwari bûn.

*Li 17 gulanê.

Wekî îro bi navê Murda Operasyonê bi tanq û top û miteralyozan êrîşa ser gel û PKK yan dikin. Wê rojê jî êrîşa ser gelê Aratê yî belangaz dikirin. Ciwan nedigotin, pîr



nedigotin, dergûş nedigotin, çi dihat ber dest û piyê wan, ew qir dikirin. Însaf merhemet di dilê wan de nemabû.

Li dewsa hêstrikan ji çavên dayika xwîn dibarî. Jin û keçên me destmalê sê rengin didan ber çavên xwe, xwe ji zînaran da diavêtin erdê. Wekî jinên me qehreman li şerê Dêrsîmê xwe diavêtin çemê Munzir, wan jî xwe diavêtin çem û geliyên Aratê, namûsa xwe nedidan dest dijmin. Hinekan namê bi xwînên xwe nivîsandi bûn û di bin keviranda veşartin. Ji nêviyên xwe re name bi xwîna xwe nivisandî bûn û di bin kevir û kuçikên Araratê da vedişartin. Hovitiya ku dijmini li me kiri bû nivisandi bûn.

Gotin, rojeka bê, me nêviyên me we hovitiye ku Romê reş li me kiri, bizanin yê heyva me ji we bistînin.

Lê wan qehremana rast gotiye. Îro şervanên me mîna te û Lêyla Gulnaz heyfa wan bi



hezar qatî ji dijmin distînine. Hetanî roja îro ew kal û pîrên ku ew zulma dîtin, gava ku qala vê mijarê dibê, zimanê wan dihatin girtine. Hêstirk di çavan wan re mîna tava barane dibarin û li ser rûyê wan dibû întîqam. Ew ew tedayî û tengasiya ku me dîtî, bira neyê serê guren çiyan digotin. Hawara dayikan û qire qira zarok û bûkan hê di guhê gelê herêmê daye.

Hevala Zîlan, Şemo wan wahşet û hovitiye ku li ser gelê Ararat û Zîlanê bûne, bi xwe xwand û ew jiyana bi xwe jî dît ku çawa Romê reş êrîş dibir ser gund û mezrayên me. Bi çi hovitiyê zarokên biçûk bi serê sûngiya xwe ve têxist in.

Ew şahîdê Licê, ew şahîdê Şirnaqê, ew deh kesên belangazê di di hundirê dolmişê de hatine şewitandin ji bîrkir.

Hevala delal, Gava meriv wan ji te re dinivsînê porê serê meriva stirî û stirî dibê.



Şemo jî hevkarê wan bûye. Îro bûyê keweka ku li ber dijmin mîna berxeka ku dikayî dikale.

Dewleta Romê reş (17.5 98) dixwaze qirbûna û talana ku li gelê Ararat kirî dîsa biderxîne.
Lê, vê carê nikarî ku bike. Ew parîya yî vê carê bi sitirî bû, yê vêcarê di qirika wan da here xar e. Ew nikarin wî parî daqultînin. Gerîla li ber wan bûne polat ji goştê xwe dîwarên paraztine çê dikirin. Gelê me hîşyar bûyê. Ew ne tenê ji me, ew ji dayikên Şemiyê ditirsin.
Dewleta Roma reş du û sê kesên xwe wekî Şemo xwe firotî dîtine. Wan alçaxana Hûskê Biroyê Têlî bi şekleka hov kuştin.
Ez nizanim, eceba Şemo ji ber gelê Şirnaq û Licê va şerm dike û an nake. Wan nanê xwe bi wî re parva kirin.
Hevala delal, Wekî tu jî dizanî di dîroka me Kurdan da hetanî niha bîst heyşt serhildan çê bûn. Keç û bûk, kal û pîrên Kurda bi merxazî û qehremanî şer kirin. Tim bi destê xaînên me, bi destên xwe firoşên me têkçûn. Dostekî me yî Ewrûpî wiha dibêje;
«Qet tucaran dijminên Kurda Kurd têk nebirin, lê Kurd bi şerê nav xwe û bi destên serok eşîrên xwe ku xwa avêtî kêleka dijminên xwe têkçûn».
Li Arartê jî wek operasyona bi navê Murad opersyon bi dartêxistin lê tu encam negirtin. Ji bo 1150 Gerîlayên Îhsan Nurî Paşa bîst hezar leşker, ji ezmanda, ji erdê da, bi xaînên Kurda ve êrîşa ser wan dikirin, lê dîsa bi wan re baş nedikirin. Dewleta Romê reş di dest Gerîla da pêrîşan keti bû. Romê reş hawara xwe kire Îranê û Îrqa faşist.



Hevala Zîlan, Li Murad operasyon jî ji bo 450 Gerîlayî 40,000 leşker û bi teknikeka nûh û bi alikariya Îsraîlê sionist, dîsa jî bi serneket in. Bi sernakevin jî. Gava ku şerê Arartê qedî. Li ser serê çiyayê Araratê gorek çê kirin û li ser wê gorê jî wiha nivîsandi bûn «Muayel Kurdistan li di vê derê de razaye». Lê te û lehengên me ew gora di serî wan da kirin parçe. Ew îro bi xwe di gora ku ji me re çê kirî kevin.



Hususi muhabirimiz dün

Şimaldeki şakiler de vahim bir hezimete uğratıldılar

Ağrı dağında demir çember içine alınan şakilerin tenkiline başlanmıştır.

Maktul şakiler arasında İrandan gelmiş sergerdeler de var, Kürt Hüseyin Paşanın oğlu Nadir yakalandı.

Son dakika...

Şarkta İranla müşterek harekete geçilecek mi?

Tenkil hareketi en şiddetli



Şîîra ku Îhsan Nûrî Paşa li ser Araratê nivîsandi ez dixwazim li vir binisînim.

Agirî Agirî tu agir bûyî
Li nav tevî serbilind bûyî
Li ser Kurdistanê çiya bûyî
Hilbê Agirî hilbê Agirî

Agir dirêjand li ser seran
Ronahî dirêjand li her deran
Erd dihêjand carcaran
Hilbê Agirî hilbê Agirî

Navalên te tijî xwîn bûn
Xalxelên te tijî candek bûn
Rastê berê agir tu bûyî

Îro agir law û keçên te bûn

Şeng û xerb bask vergirtiye
Ser sînga xwe bask wergirtiye
Kurdann re tu kabê bûyî
Hilbê Agirî hilbê Agirî

Îro dîsa hêrsa te hat
Ew agiran bûne kelat
Kom bûn êdî li ser te civat
Hilbê Agirî hilbê Agirî

Hilbê Agirî hilbê Agirî
Ji sewa te tirk digirî
Te dît çawa Romî revî
Hilbê Agirî hilbê Agirî.
Îhsan Nûrî Paşa

Îro 17 îlon e.

Kek Mesût îro dîsa mêvanê Anker ê. Ji rêzeda destê kê hat ber wî, wî ew desta guwişt.



Mesût ji Ankarê vegerî û bi Mam Celal ve çû Amerîka. Ew du sê sal in ji hev xeyidîne. Ev dê niha bi destê Amerîka li hev bên e. Eger ku Amerîka karek bikira û Fedê û alîkarî ji gelê Kurd ra bikira, yê ewil ji bavê wî Mele Mistefê re bikira. Mele Mistefa jî pir caran çû Amerîka û Ewrûpa. Amerîka bi wî mêrxwazi re du gotin digotin, di dûv gotinên xwe nedihatin. Kissînger pir caran ew xapand. Lê çi bû Egit û mêrxwaze Kurda Mele Mistefa li Amerîka mir.

Îro 18-19 îlon e 1998 a ye.

Îro kek Mesût û Mam Celal li Amerîka peyman îmzê kirin. Peymana xwe ev e.



1- Herdu hêz jî li hembera PKK e şer bikin e.
2-Madî û manevî qet tucaran alikariya PKK e nekine. Dostên me Tirk ji alikariya we ya PKK e pir aciz in.
3- PKK e ji Başûr bi derxînin û cî nedin Gerîla ji bo alikariya lojistik.
4- Arteşa tirkan wekî çavdêr li Başûr bimîne û we jî PKK e bipareze.

Hevala delal, Mifta koxikê teslima gur bikine. Romê reş î hetanî roja îro me dikuje, ji îro şûnda me biparez e. Bi vê re dibêjin, malê Xwedê hezarcarî ava be!!!.
Lê va ne îxanete va çiye?
Öcalan wiha got bû; «Em xwediyê vê axen ê. Tu hêz nikarin me ji ser axa me derxînin. Bi tenê gelê me dikare me ji ser vê axê derxîne. PKK e gelê, gel jî PKK e ye».
Mam Celal ji bo vê peymane wiha got; **«**Ev peymana ku di navbera me *Amerîka da hatî îmzekirine tiştekî pir pêwîst ê. Bi vê peymanê, dîroka gelê me ya tijî êş, zor û zehmetî tê girtin. Êdî ji herdu aliyan re bes e, divê em li ser masekê rûnin peymanên wiha bi dostên xwe îmze bikin. Va cuda bûna, Va parçe bûna me û gelê me re tu Fedê nîne»***.***
Mesût jî wiha axifî;
*«Li wan rojên dawiye tiştekî pir baş me ava kir. Va peymana bê îmze kirine. Her du alî jî divê bi hesasiyeteka pir mezin vê peymanê bişopînin û zerara nedin hev».*

Hevala Zîlan û Sema, ji Başûr ji sala 1964 an pêva peyman têne îmze kirin.

Çi hikmeta Xwedê yê, temene van peymana çar pênç meha diajo an na!? Carna jî sê çar hefta diajo. Dû re jî herdu alî hevdu bi qontra û bi îxanetê û cahşitiyê tevanbar dikin.
Yek dibêje: Mam Celal bi Tehrane re kar dike. Mam Celal Dibêje: Na Mesût bi Tirkiyê re kar dike destê partiya bas di nava karê Mesût dayê.
Di sala 1966 an de gava Îbrahim Ahmed bi Mam Celal ve ji PDK veqetiyan. Bi hezaran meriv ji hev kuşt in.
Li sala 1966 da di navbera hevdu da peymnek çêkirin ji bo ku bi hev re şer nekin.
Di vê pêvajoyê de herdu aliya jî xwe nêzîka hikmata Baxdaye kirin. Bi salan bi hev re kar kirin, bi dizî û aşkere. Di 13 adare 1970 an de di navbera PDK û hikmata Baxdaye peyman hat çê kirine.
Gava Celal bi hevalên xwe ve, va peyman bihîstin, di demeka kurta xwe fes kirin dîsa hatin teva PDK e bûn. Wan vê carê jî soz dan hev ku di nav bera hevda şer nekin, yek li alehîye yekî nepeyve û yek li lingê yekî nexîne. Lê gava ku yek ji wan diçû cem Saddam.
Hevdû bi Sedam gilî dikirin,bi Mesût pir bawer nekin. Yê din digot; bi Mam Celal



Bawer nekin. Mam Celal têkiliyên xwe bi Tahranê re hene. Dijmin jî êdî piskolojiya wan pir baş dizane. Lê dijmin ev wekî du kewên ku dikayin didane deng kirine. Gava ku kê kî pir gilî dikir, wî pir silah û alîkarî werdigirt.
Di sala 1975 an da Mam Celal dîsa ji heza PDK veqetî. Di aynî salê de rêxistina YNK saz kir.
Gava ku Mam Celal YNK saz kir, ew ne bi serê xwe bû. Wî bi alikariya Îran û Baxdayê partî saz kir. Her du aliyan jî bi hezaran ji hev meriv kuşt bûn. Wekî du dijminan li hev dinêrîn. Wî digot Mesût Qontrayê yê din digot Celal berdevkê Sadam e. Ewqas hekeret li hev dikirin meriva bi çavên xwe û guhên xwe ew gotinan bawar nedikirin.
Bi alikariya Îran di sala 1986 an da dîsa herdu alî hatin cem hev.
Hevala Zîlan, gava nekokiyek di navbera me de çê dibe. Em bi xwe xwe li hev nayên an wê pirse hal çareser nakin, mûhakak dijminê me dikeve navbera me, me li hev tîne, di navberame de sulh çêdike.
Li Kirmanşahê peymanek hat îmze kirine. Piştra êniya Kurdistanê hat saz kirine.
Li sala 1991 an de li hembera Îraqê serhildan çê bû. Hema di dû serhildanê herdu aliyan jî bi lez û bezeke hilbijartin bi darxistin. Wekî ji hev meriva bidizin.
50 Mebus kete para Celal. 50 mebûs jî kete para Kek Mesût. Çi hikmet bû, tê bêyî ew bi teraziye hatibûn pîvandin. Ev hikumata heta sala 1994 an alikariya Îngilîz û Amerîka li ser piyan sekinî. Amerîka dest û piyê Sedamê faşist girêda bûn. Wî ne dikarî ku bê Kurdistanê. Mesût digot mala min û eşîreta min, yê din digot mala min û eşîreta min. Yek dihat Ankerê li dîndara serok wezîrê Roma reş disekinî. Yek diçû Tehranê li dîndara Mela û destê xwe didian ser zikî xwe mîna merivê reşê xwe girêda yî disekinî. Ew bi rojan û heftayan li salonên dijminên xwe disekini û ji wan alikarî dixwastin. Gava dewleta Roma reş alîkarî bi wan re dikir ji wan soza distandin ku merivên wan bên Kurdistane li cem Turkmena kar bikin. Roma reş hemû sixûr û ajanên xwe bi rê dişandin Kurdistanê, li herêma Kurdîstanê her roj provakasyonek çê

dikirin an bi dardixist in. Bi sedan kesên sivil dikuştin. Niha jî Mesût bi Celal va bi pîstî hev diket in.
Di sala 1996 an da li ser daxwaza Îngilîzan dîsa hatin cem hev. Pêvajoya Anqerê îmze kirin. Hûn ê PKK ji Başûr bi derxînin.
Li cotmeha 1996 an peymana Ankerê hat îmze kirin. Vê caê jî peymana Ankerê dest pê kir.

îro 24 îlone 1998 a ye.

Serok HEDEP birêz Murad Bozlak û rêvebirên partiyê ji girtîngeha Haymanê hatin berdane. Gava ku ew hatin berdane xwastin ku li Stanbulê meşeke ji bo aşitiyê bi darxinin, lê dijmin destûra meşê neda wan. Dijmin zanî bi sedhezaran kesên welatparêzê beşdara wê meşe bibin e. Ji bo vê destûr neda wan.

Îro Gerîlayê Enternesyonalist Eva Juhnke bi 15 sal şeş meha hat ceza kirine.



Dewleta Alman ji bo wî cezayî wiha got; «DGM ne dadigehên nûjanin(modern). Ew dadgahan bi zagonên Hamurabî tên îdarekirine û dozger û savciyê wê jî kevne perest in. Bi we şekle nabin endame Ewrûpa».


Hevala Zîlan; Roma reş ketiye dûv me. Tê bêyî ku dergûşeka xwe li cem me.

Wan rojana dîsa dixwazine ekranê MED tv reş biki.

Sinyala li ser sinyala dikşîne ser satalîta MED tv e bernameyên sîyasî asteng dikine.

Îro 26 ê îlone 1998 a ye.

Agirbesta ku ji aliya Serokê Abdullah Öcalan ve hatî ilan kirine kete hefteyaçaran.



dijmin vê ji xwe re wekî firsend dibîne û bi hemû hêzên xwe êrîşa ser gel û gerîla û sivîlan dike. Gotineka Şemdîn Sakik bi dijmin re hebû. *«Em ê li ser soza xwe bisekinin. Gava me agirbest îlan kir, me bi temamî riyayata agirbestê kir. Me qurşunek bile na avêt». Serok dibêje «Em li ser şor û peymana xwe ne û yeterkî ma dijmin li ser gotinên xwe bisekine û bibe xwediyê soza xwe bin».*

Îro 26 îlone 1998 a ye.

Wekî hûn jî dizanin va çend sal in ku dayikên ku ewledê bedena xwe ji aliyê dijmin ve



hatî revandine yan jî hatine kuştine, li her roja şemîyê tên taxa Qadiköyê li ber Lisa Galatasara yê Roma reş û dewleta wana faşista protosto dikin. Va 176 heftenê dayik bi baweriyeka mezin li hev kom dibin, bi serhîşkî diçin ser dijmin. Lê dijmin bi ser hişkî û baweriya wan baş nakir in. Vê carê polîsê faşistin li dijî wan qaz bi kar anîn. Hemû dayik bi darê zorê li otobusê sîwar kirin û vê carê jî di hundirê otobusta qaza çava avêtin ser rûyê wan. Hemû dayik ji ber qazê bîrva çûn û verşîn û qetliyama Helepçê hat bîra meriva. Gelo ew jî dixwazin wek Seddam Hiseyin bikin?

Îro 27 îlonê 1998 a ye.

Li yekê îlonê Öcalan destê xwe yî dostaniyê dîsa dirêşa Roma reş kir, ji bo wê helwestê hê tu xet û xeber ji Romê reş derneketine.



Îro jî me/Öcalan destê xwe yî biratî û dostanî dirêşa birayê xwe kek Mesût û heval bende wî kir. Îro li piştî seat 24:00 an de gerîla şer da sekinandin e. Gotin; êdî bes e birakujî. Ew dest dirêş kirina me him ji aliyê Kurdên Bakûr û him ji aliyê Başûr ve jî bi kêf xwaşî û bi şadimanîyeka mezin hat pêşwazî kirin. Gava ku birêz Öcalan ew agirbesta îlan kir, Kek Mesût bi Celel ve li Amerîka bûn. Amerîka şanseka din da Kurdên Başûr gotin, herin dewleteka xwe Fedêre ava bikin. Serokê birêz ji bo vê şansa ku ji aliyê Amerîka ve hatî dayin, şer da sekinandin e.

Roma reş wekî merivê ku gurî bûyî ji bo Fedêrasyone qûna xwe di erdê dide û xwe li çiya dide. Li aliyê din PKDW e wan rojan di haziriya civîna xwe 6 emîn daye. Kîngê bicivine û li kîjan welatî bibine mêvanin em nizanin. Wan rojên li pêş me ya aşkere bibe ku li kîjan welatî bicivîne. Dewleta Roma reş wekî dedektifa dixebite û ku civîne sabotê bike. ( Foto Serokê PKDW Îsmet Şerîf Wanli)

Hevala Zîlan û Sema, Îro li seat 13:00 hat eşkere kirine ku PKDW e li paytexta Îtalya di avahiya parlemento ya Îtalya da civîna xwe ya 6 emîn pêk bîne. Serokê Belediya Roma û Vezire adaletê yî Roma yê, hinek nunerê partiyên Îtalî Qedir û qimeteka mezin dan hatina parlamenên Kurd. Li kêleka avahiya Pappa John poul serokê elema Xiristiyan civîyan. Îtalya pir caran Kurd û mezinên Kurda li cem xwe kirin mêvan. Îro jî bi hezaran penabarên me li Îtalya di qampa da dijin.



Parlementerekî Îtalî wiha dibêje: «*Di navbera salên 68 û 70 an da navbera me Kurdên Başûr pir baş bû, me alîkariya wan jî gelek dikir. Lê me bi wan ra got hûn çi dixwazine?. Fedêresyone dixwazine? Otonomîyê dixwazine an serxwebûne dixwazine? Van tu bersivê bi serî û binî nedidan me. Em daxwaza we bizanin, bi tenê alîkarî nabe. Lê, îro em û hûn dizanin Kurd çi dixwazine. Ji bo wê deriyê hemû avahiyên me hetanî ber dev ji we re vekirin*».

Îro 65 parlementerê me nû li avahiya parlemento sond xwarin. Ew civîna sê roja bidome.

Hevalno, wekî hûn jî dizanin pir kalê mêrên me bi wê birîna reş mirin. Apê Musê ji bo vê birîne pirtûkêk jî nivîsandi bû û navê wê pirtûkê kir bû Birîna Reş. Yanî qesta wî pirsa Kurd bû, ji bo wê nav pirtûka xwe kiri bû birîna reş. Xweskek îro Apê Musê ji li nav vê civîna Roma yê hebûya. Cixara xwe di devê xwe kira, ji maseke biçûya maseyeke din. Bi hevalan re henekên xwe bikirana. Bi wan henekên xwe xweş mesaj ji Roma reş ra bişanda. Di vê civîneda 14 milltvekilên Îtalî. Dostê me yî hêja rojnamevan DINO Frosilo Wekî xwediyê malê hereket dikir û mêvan pêşwazî dikirin. Roma reş bi hereketên Dino dîn dibûn.

Wekî din kî hebû dizanî?

Kî tune bû kî!

Xwezûrê Celal Telabanî Îbrahim Ahmed**,** kalê 78 salî, hebû. Kalê ku temenê xwe li vê riyê borandî Ismet Şerif Wanli hebû. Ji hemû cîhanê da mesaj dihatin.

Ez di jiyana xwe da tu caran ewqas kêf xweş nebûm. Carekê îro carekê jî gava MED tv e dest bi weşanên xwe kirin. Gava PKDW bi avakî fermî li Îtalya civiyan ez ji kêfan giriyam. Hesreta sed sala di dilê min di dilê gelê me da hat cî. (Foto Îbrahim Ehmed û Wanli)

Îro 01 Cotmehe 1998 a ye. Civîna Îtalya serfirazîyeka mezin xelas bû. Li vir biryarên pir baş hatin girtin. Biryara herî baş jî Qonfereseka Kurd li Ewrûpa bi darxînîn û vê qonferansê derbasî jiyanekin. Ji her aliyên Kurdistanê mêvan hebûn. Ew jî bi me dide xuya kirine ku yekitîya me nêzîk e.

Îro 06 Cotmehê 1998 a ye.

Dijminê me ji aşitî û hevalatiye fem nake. 35-40 roj di ser agirbesta ku ji aliyê birêz



Öcalan ve hatî îlan kirine re derbas bû. Hê ti deng ji dijmin derneketiye. Ma deng bisekine. Hetanî roja ma îro 53 operesyonên mezin li dijî gerîla bi darxist in. Lê bi derewan her carê ku ji operesyonan dizivirin jî dibêjin, me pişta bi deh deran li PKK e şkand, êdî PKK e xwe berhev nake. Wan rojan dîsa ji bo ku operesyonan bikin, dêl û dêlêgurên xwe dane dûv xwe bi deh hezar leşker û helîqopter, top, tanq li herne operesyona.
Derbeyên ku gerîla li wan didin kezeb wan dişevtîne û ji bo wê Suryê rexne dikine, dibêjine serê marî li Şam e. Hûn Apo li ba xwe diparezin. Çi ji devê wan tê bi Suryê re dibêjin. Ev gotinek heye: Pehlewanî ku piştê xwe hatî erdê ji gêrbûne têrnaxwe. Ew têkçûne qabul nakin.
Rojnamê tirkan îro li rojnamên xwe wiha nivîsandine:
Dewletê hetanî niha sê caran kemin dan ber serokê PKK e Apo. Her sê caran jî Apo bi zorê jê xelas bû.
Gava serok di Med tv da got; «Romê reş îro dîsa li hembera min provakasyoneka mezin bi darxstin». Lê dewletê digot ew derewa dike.
Lê îro ev rûreşiya ku li hembera serok hatî kirine. Ew xwe bi vê dipêsînin û li xwe mikur tên.

Îro 8 Cotmehe 1998 a ye.

Serokê birêz Öcalan, îro xwast şerê qirêjî li welatê me ji aliya dijmin ve tê meşandine



aşkere bike. Lê dewletê naxwast ku ma serok vê qirêja ku li ser gelê me yî belengaz dikin/û dibe aşkere bikin ji bo wê bernamên MED tv asteg kirin û sinyal şandin.
Agirbesata ku ji aliya serok Öcalan ve hatî îlan kirine.

Dewlet bersivê nade, girtiyekî bi navê Xalit Oral Ji bo ku dewleta Romê reş şermezar



bike xwe li girtingeha Maraşê şevitand.
Şaîrê mezin Ahmet Arîf vala negotibû;

Keçên min hene
Lavê min hene
Heryek bedela cîhanekê.

Îştê îro keç û xortên Ahmed Arif bersive didin dijmin.
Welatparêzên xwe ji bo serokê xwe xwe şewitandî.

1- M. Halit ORAL, Cotmeh 1998, zîndana Maraşê
2-Mehmet GÜL, 19 Cotmeh 1998, zîndana Amasye yê
3-Ali AYDIN, 20 Ekim 1998, zîndana Bartînê
4-Bülent BAYRAM, 21 Ekim 1998, Zîndana Adıyamanê
5-Hasan İsa Hasan, 22 Cotmeh 1998, Qamışlı,
6-Selamet MENTEŞ, 23 Cotmeh 1998, Zîndana Midyatê
7-Aynur ARTAN, 23 Cotmeh 1998, zîndana Mîdyatê
8-Mirza SEVİMLİ, 26 Ekim 1998, zîndana Erzuromê
9-Barzan ÖZTÜRK, 1 Cotmeh 1998, Almanya (4 Ocak 1999'da jiyana xwe ji dest da)
10-Mehmet AYDIN, 13 mijdar 1998, Zîndana Çanakkalê
11-Erdal ÇEKEN, 13 mijdar 1998, Zîndana Mardinê
12-Kadri İLHAN, 16 mijdar 1998, Zîndana Sêrtê
13-Ahmet YILDIRIM, 17 mijdar 1998, Moskova,
14-Remzi AKKUŞ, 17 mijdar 1998, Moskova,
15-Emrullah DAMLAYICI, 18 mijdar 1998, Qamışlo
16-Cemil ÖZALP, 27 mijdar 1998, Diyarbakır
17-Mirza ÇUBUKÇU, 27 mijdar 1998 (Batman zindanında açlık grevinde)
18-Yavuz GÜZEL, 30 mijdar 1999, Bartın zindanı
19-Hatice FALAY, 13 berfanbar(12) 1998, İstanbul
20-Taylan Özgür KAHRAMAN, 21 berfanbar(12) 1998, Almanya
21-Hamdiye KAPLAN, 24 berfanbar(12) 1998, Van
22-Hükmiye SEYHAN, berfanbar(12) 1999, BDT
23-Baki TATLI, 5 Nisan 1999, Bingöl
24-Felat KADİR, 25 Şibat 1999
25-Meral MAMYAK, 27 adar 1999, Taxa Taksimê İstanbul
26-Tacettin ŞAHİN, 5 Gulan 1999, Başkale
27-Nezahat BARACI, 20 Adar 1999

28Nesrin TEKE, 9 Tîrmeh 2000, Amed
29-Mahmut YENER, 8 Tîrmeh 2000
30-Erdoğan KAHRAMAN (Yekta) 28 adar 2004 Qamışlo
31-Şahin HÜSEYİN, Güneybatı Kürdistan
32-Fatoş SAĞLAMGÖZ, 11 mijdar 2003
33-Serdar ARI, 25 Cotmeh 2005, Zîndana İzmir Buca yê
34-Leyla Walî HASAN 6 Şibat 2006
35-Elefteriya FORTULAKİ, 24 Adar 2006, Yunanistan
36-Veysi KAYA, 28 Şibat 2006, Adana
37 Aynur YAŞLI, 30 Adar 2006, Antalya

Belê Xalit Oral îro 09 cotmehe.



Hevalê delal, ez ji we re Îro qala rojeka pir xemgine ji bo gelên cîhanê bindest bikim. Bi milyonan karker û bi sed milyonan xwendevan li vê rojê xemgîn bûn û reşa xwe girêdan. Amerîka vê rojê Gerîlaye qehreman CHE Guvera kuşt in. Îro qedir û qimeta wî li cîhanê belav bûye.

Lê, li vê rojê Roma reş jî xwast ku serokê birêz Öcalan bikûjin. Eger planên Roma reş wê şevê bi serketana, êdî Kurd û Kurdistan tu tişt nedima.
Roma reş, tu riyên ku serê xwe lê nexistî nemanbûn ji bo ku serok Öcalan bikijûn. Li Tirkiyê û Îranê bi salanê ku li hev rûdinin hesabe vê dikine. ”Em ê çawa Öcalan bikujin”Lê dîsa jî ew bi ser neket in. Bi rastî ji kuştian serok dawî hatina pirsa Kurd e. Êdî li Tirkiyê kes nikare vê pirsê di devê xwe re derxine.



(Foto ew fîlmê Kurtlar vadîsî yê. Wiha tasarim/plan kirine ku Öcalan bikujin)
Roma reş provakasyona amede dike ji bo serok Öcalan ji ortê rakin. Merivê xwe dişîne cem serok û dibêjin, te xwastiyê wî cî, yan jî li vî cê em hevdu bibînin. Serok Öcalan ji wan dipirsê: Çima hûn li ser wan herdu cîyan pir disekinine, min fem nekir?. Ew ji bo wê dikeve gumane bersive nade wan. Wan hemû planên xwe çêkiri bûn. «Girîk ji Îskenderyê da Fûza bişînin min û Hafiz Esad ji ortê rakin. Elbet li vir rola Amerîka mezin e. Ew ne planên Roma reş in. Planên Roma reş qeleşî û rûreşiye. Ez terbiya wan baş dizanim ku wan di dîrokeda çawa gel xapandine û ji ortê rakirine»

Hevalê Xalit li dirokê binêre!
Ne dewleta Osmaniya, ne jî bermaye wan Atatûrk bawariya xwe bi Tirkan dianiye.
Atatûrk jî bi xwe dizanî Rom xaînin. Rom roviyê berî kendalane. Ne dixwast ku wan di nav rêvebiriya xwe de bigir in û bi wan giliyê xwe bike. Gava ku Yavuz Sultan Selim kete Stanbulê, çil vezîrî xwe hebû. Ji wan yekî tirk bile teve wan tune bû.
Gava peyman çêdikirin bidizî çêdikir, xeber nedida nunerê Roma reş. Dizanî ku ew ê planên wan têkbibin, îxanetê li wan bikin. Ji bo wê her tim gelên din Ereb û Ermenî, Asurî û Kurd bi xwe re dibirin. Qet tu cara bi tirkan bawerî nedikirin. Hetanî îro jî kes ne jî dewlet bawerî xwe bi Tirkan nînin. Ji bo wê li çiya û baniya nivîsandiye “Ne mutlu Turkum diyene”. Gava ku Osmanî li wan diqahirîn ew dişandin sûrgûniyê, Sûrgûnê Malta û Yemenê hemû ji wan bûn.
Ji bo qomploya ku li hembera Serok Öcalan hatî bi darxistine, Kurdekî welat parêz bi navê Murat Kaya qolanyax li canê xwe kir û xwe şewitand. Ew pir xeter bi birîn bibû. Gava ew birin nexweşxanê dahî di nav wan êşan da diqirî digot bijî Apo.
Bijî PKK e.
Em bi can û xwîn bi te ra ne.
Hevalno
Belê Bedenek li dû bedenekê xwe dişewtinine. Keçên me bedew, xortên me çeleng.

Xwe bi agirê Newrozê, bi agirê azadiye dişone. Di dîroka gelan de ewqas xort û keçan xwe neşwtandin e.

Sema, Fikrî, Xalit û Murat. Li welatê Roma reş xwe di zîndanên cuda cuda da agir bi bedena xwe xistin «Em henî û em ê hertim jî hebin», dibêjin.

Dijmin li vê meha adarê har bûye, dîn bûye, bi hemû hêza xwe diajoyê ser gelê me. Çi dixwaze ma hûn dizanî?

Serê birêz Öcalan dixwazine! Ew jî bav û kalên xwe da hînî serî jêkirine bûne.

Lê, vê carê ew ê serê xwe li kêleka xwe bibînin. Hetanî roja îro bi dehan kesên welat hez xwe ji bo serokê xwe xwe şewitandin.

Serokê birêz wiha got ji bo wan mêrxazana.*«Ez ê hetanî dawiyê bi şahdata wan girêdayî bimînim. Çalakiyên wan ji dil û can ve pîroz dikim. Em ji Anqerê derketin, bûn Partî. Ji Kurdistanê derketin bûn ordî. Em ê ji Kurdistanê derkevin bibin dewlet»*

Murat Zîlan û Sema, îro 12 Cotmeh e.

Qir kirin, talan kirin, tedayî, zûlm bi hemû hêza xwe li ser gelê me didomê. Şerekî din î nûh xwe daye ser milê me. Dewleta Roma reş dixwaze me terorizê bike.

Ji her deh deqîqa careke ekrane MED tv e reş dike. Med Tv e bûye kelem di çavên dijmin re diçe xar e. Li gor tespîtên satalita MED Tv e, ew sînyalana ji avahiya fermandariyê tên şandine.




Dengê Öcalan wan pir aciz dike, xewa şeva li wan diherimîne.

Îro Danzde cotmeh e. Di danzde cotmehê sala 1993 an de, gelê Kurd lawekî xwe yî hêja wanda kir.

Ez ji we re qala wî mêrxwazî bikim.

Ew bi kêf û bi dilxwaziyeka mezin çû ser heqiya xwe. Digot, min pir bîrya hevalê xwe kir. Ew çû cem hevalên xwe hêja.

Nunerên Xoybûne, Şêx Abdulqadir, Mele Mistefa Berzanî, Serokê Kommara Mihabatê Memhemed Qazî, Alî Şêr, Îhsan Nurî, Kemal Fevzî, Hecî Extî, Nurî Dersîmî ew niha li ba wan e.

Di quncekî cennetê da ew îro civîna xwe pêk tînin.

Dawiya Xoybûne nehati bû. Wan hesabê xwe bi xwe re birin gor e.




Ew mêrxwaza OSMAN SEBRÎ bû. Navê xwe yî din Apê Osman bû.

Ew jî mîna her Kurdekî çav vekirî çû ser heqiya xwe. Daxwaza wan ne pere ne jî malê dinya yê bû. Daxwza wan tenê Kurd û Kurdistan bû.

Îro dîsa wekî şeva berê pirtir,
bihna min teng bû.

Dîsa derdê min serî hilnan,
Dorpaş min, tijî jan, êş bûn
Li dor xwe nêrî
Dîsa ez bi tenê me
Bi derdê welat
Bi hesreta welat dişewtime.

Keda wî di têkoşîna welata pir mezin bû. Ew him şair bû, him ziman zana bû, him rêber bû. Ji bajar Samsurê, li gundê ----- hatibû xwedê dan.

Ji we re marşa Kurdiya ku ji aliyê Osman Sebrî va hatî nivîsandine, ji bo bîranina wî mêrxwazî diyarî we bikim.

## MARŞA XORTAN

Kurd in, em şêrên çiyanin, dê bijîn serbest û gûr
Doza me tola welat e bistînin bi qewdê û şûr
Heya dih me xwe ne nasî, lê îro bûne şiyar
Dehrifîne sihna Kurdan çi çiya lat û zinar
Da cîhan qenç zanî bit ko, Kurd êdî nabin zelîl
Nema datînin serên xwe, namînin bindest û dil
Em welatiyê civanin, wekî piling dikine qîr
Me divê yektî û xurtî, naxwazim bend û eşîr
Ji îro pêva di Asiya, serdestî dora me ye,
Dê jêkin hemû serên konabêjin va her we ye
Destê me şûr û tifing in, şopa me xwîn û mirin
Xortno ! rabin dem nîzik bû, bo felatê şer kin.

Gava serok Öcalan çû serdanî Osman Sabrî wî mêrxazî ew marşa teslîma birêz Öcalan kiri bû. «Ew emaneta te ye. Ez bi te pir bawer im. Ez xelasiya gelê Kurd di rûhê te da dibînim. Ez ji bo wê, vê merşê telima te dikim. Çavê te maç dikim, ji te re serkeftin dixwazim. Bê ser gora min mizgina welêt bide min. Daxwaza min ji te ew e.»




Hevala Zîlan û Sema, Welatê me şevên paîzê sar in, dev û pozê meriva diqelşîne û du yekinê Gerîla xwe davêjin ber kendalekî ji bo ku xwe ji serma û seqemê paîzê xwe biparez in. Ji wan her du yekînan, pire wan keçên Gerîla bûn. Li navbera Xelat û Bexerê li ser axa bav û kalên xwe bûn. Li ser axa ma ku xwîna me pê hatî avdanê, xwe diparêzin. PDK xeberê ji aliyê xaînan ve dibihîze ku Gerîla li vê mintiqê hene.

PDK ji çar aliyada êrîş e dibe ser wan, li dijî wan çekên mezin bi kar tîne. Bi seatan, wan didin ber gula. Panzde gerîla dikujin, neh gerîla jî dîl dikevin dest wan. Ew wan her 9 gerîlayên ku dîl ketî destê wan didin ber gula û wan jî dikuj in.

Tu kê dikujî, malweran?!!!

Hevala Zîlan û Sema; Gava serokê Öcalan agirbest îlan kir. Gerîla neh pêşmergê

dîlhatin girtin û ew teslima saziya Emnestîyê (afuyê) kirin. Wiha gotin*, «Em ne li dijî aşitiyêne. Em jî li ser vê axê henî û xwediyê vê axê ne. Em temînata her çar aliyên Kurdistanen e. Eger em li vir nebin, Roma reş destûr nade hûn seatekê jî li vir bijîn. »*



Hevalê Xalit Oral û Murat îro 15 cotmeh e.

Di dîroka cîhaneda leheng, mêrxwaz û egît tim û tim hatine pesandine.
Mînak dixwazî; Mandela, Nasir, Lenîn, Allendê, **Berzanî** wan dilê merivatiyeda ciyekî pir mezin girtine û her tim wan bi bîr tên.
Lê, xaîn! xwînxwar! faşistên dest bi xwînê mîna Kenan Evren, Pînocehtî, Hîtler, Musolin, hertim hatine nefret kirine û tifa rûyên wan e girêj kirine. Pinocehtî jî wekî faşistê me Kenan Evren bi deh hezaran gelê Şilîlî kuşt in û bideh hezaran wenda kirin, ji ber deriya, bi roj û nîvro merivên welatparêz direvandin. Bi milyonan însan ji ber zulma wan direviya, eskera li ser gelê Şîliyêyî welatpaerêz agir dibarand. Serokê Şilîyî **Sosyalist Allende** kuştin. Allendê jî wekî gerîlayên me qehreman xwe neda dest wan silaha xwe kişand li hembera wan bi mêrxazî şer kir. Îro Allendê di dilê her merivekî welat perêzda ciyekî mezin girtiye. Pînochetî û Evren di nav nefretê de dijîn e.
Pînocehtî hat Înglîstan ji bo tedûristiya xwe. Li ser daxwaza Emnestî Înternasyonal û saziyên dine sivîl hat bin çav kirine. Li **16.10 98** an da jî ew girtin birin xaniyekî wekî girtingeh kirin bin çav. Ew bûyara mîna bombekê li cîhanê belav bû. Kesî ji hev bawer nedikir. Ma rastê dibêjine, Pînocetî hatiye girtine?
- Hinekan digotin: Na lo! hûn henek dikinin. Em bawer nakim.
- Bawer bike! bawer bike!.

Hevalê Xalit Oral, îro 24 cotmehe.

Ew suiqasta ku li hembera serokê birêz Öcalan bûyî "alana" (yankı) ya xwe didome.



Deh hezar girtiyên PKK e li hemû zindanên Tirkiyê dest bi greva birçî bûne kirin. Ev greva sê rojan bajo ye. Li girtingeha Ankerê Ulucana di serî da Leyla Zana, Xatip Diclê, Selim Sadaq, Orhan Doxan jî ketin greva birçî bûne.
Mamostê me, Ronîya çavê me, Dilê me, Rûhê me
Îsmail Beşikçî jî kete greva birçî bûne.
Wiha got: «Ew ji bo min goreva herî mezine. Ez mecburim wê goreva xwe bînim cîh»

Hevalê Xalit Oral îro 28 cotmehe.

Hêjmara girtiyên ku xwe di dû serokê xwe xwe şewitandî, gihştin 14 an. Ez ji bo wan gelek xemgîn dibim, her yek ji wan can û welateke. Her bedena ku dişewtê ji bo me serveteke. Dijmin li hembera wan şaş û mat maye. Wan jî nedizanî, Kurd ewqas girêdayî ye serokê xwe ne.



Min got lê, Îro 28 cotmeh e. Îro Şemo jî derxistin ber dadgahê huzura hevalên xwe. Şemo dawazname/dîlekçê da serokê dadgahê go Got Birêz Dozger; «Ez jî wek hemwelatiyekî we dixwazim ji zagonên we ku we ji bo poşmaniye, ji poşmankaran ra derxistî jê îstifade bigirim».
Serok dozger ji wî pirse.
- Tu xwe niha xwe jî kîjan milletî dihesibînî ?
- Ez niha xwe wekî Tirkekî li Tirkiyê dijî xwe dihesibînim..
- Dozger, tu ne îtrafkarî ku em dilekça te di dosyexinin, ew jî bo îtrafkara yê. Ew tiştên ku te bi me re peyivî, hemû rast derneketin.
Gava ku di navbera Tirkiyê û Suryê da şer derkeve û an şerek bibê. Tu ê çawa hereket bikî û piştgiriya kîjan alî bikî.
- Ez jî wek merivêkî tirk reaksiyona xwe nîşan bidim.
- Spas, emê li ser vê daxwaza te bifikirin.
Hevala delal, Ez nizanim çi bêjim, bi vê axaftine di navbera Şemo û dozger. Hûn heq bidene. Ma xwendevan biryare biden e.

Hevalê Xalit Oral, îro 29 Cotmehê.

Li welatê Roma reş cejn e. Cejna gel qirkirine. Ew 75 saliya xwe ku li ser gelê bindestê wek Ermenî, Asurî, Kurd qirkirine pîroz dikine. Ew 75 saliya zûlma ku li ser



belengaz û xizanan kiri pîroz dikine. Komara ku bi xwîna wan hatî avdane pîroz dikine. Mistefa Kemalê bêesil û bênesil. Kurd dan dû xwe çû Lozane. Peymana Lozan bi wan da îmze kirine. Peymana serv bi wan da îmzê kirin. Piştî wê îmzekirine dora dina rojê zûlma Romê reş li ser Kurda dest pê kir. Bi sedan xortên me û keçên me di zîndanên wan da can dan. Îro li derva û li hundir bi milyonan gelê Kurd rabûye ser piya. Elbet xaîn minafiq jî li vir vala nasekinine. Lê min got; Rom 75 saliya xwe pîroz dike. Bi faşistên xwe ve, bi Qomistên xwe ve, bi ronekbîrên çep û ras ve, tev hev komara xwe pîroz dikine.

Îro hetanî seat 19:30 an bi hovitî û şovenizmeka mezin cejna pîroz kirin.

Di seat 20:30 an de nûçeyek deqa dawî li hemû cîhanê belav bû. Tirk jî bi vê nûçê şaş



û mat man. Balafira ku ji Adenê rabûyî berva îstîqametê Ankerê difirî, ji aliya welatperêzekî ve hat revandin.

Wî bi pîlot ra wiha got, *« Ma îstîqametê te Lozan be. Komara Roma reş li Lozanê saz bû, em ê wê li Lozanê jî Perçe bikim».* Em niha di derheqê vê çalakiyeda pir tiştî nizanin, Çalakî hê tezeyê.

Sema, Erdal, Xalit Oral îro 30 cotmehe 98 a ye.

Birêz Erdal pîroz kirina komerê wan di qirika wan da hîşt. Lê wan dîsa rûyê xwe yî hov û rûyê xwe yî reş nimandin. Lê Erdal bi hovitiyeka mezin şehîd kirin.

Rêwiyekî bala firê dibêje, korsan bi me re wiha got. *« Hûn qet netirsin û di ciyê xwe de rûnin. Ez tu xirabiye li we nakim. Ez ê wê li Lozane serbst berdim. Ez Kurd im, milletê Kurd di bin zulma Romê reş daye. Min ji bo vê ew balafîra rewand».* Wî Ewqas bi me re got

Namê ji Hevalê Erdal re

Sipas, sipas hezarcarî sipas

Te bi çalakiya xwe wekî heval Zîlan xençer di kezaba dijmin da sar kir.

Te mesaj da gelê xwe yî bin dest û belangaz. Em henî û em ê her daîma jî hebin

Ruhê Xwîşka Zîlanê yî bêtirs ketibû dilê te. Te Zîlan û Leyla ji xwe re kiri bûn rêber.

Te birîna heftê pênc salî derkirin

Te got, min bi Lozanê gihnin

Va axê pîroz li wir perçe bû

Emê li wir jî saz bikin

Tu mêr bûyî, ji şêranda keti

Tu bi kawa yê hesinkar re, hatî ser vê axê

Ew bi dêl û dêlê guran re hatin wan derna

Tu bi şîrê helal mezin bûyî,

Bi şîrê heram mezin ne bûyî.


Hevalê Erdal; Diya te di dû te wiha axifî;


”Ew li roja înê hatibû xwedê dane, Roja înê ji bo min û ji bo gelê Misliman rojeka pir

pîroz e. Lawê min; ”Şîrî min li te helal be, bibe çirê ronahî ye bide şehîdên me. Ez û xwîşkên te bi te serbilind in. Lawê min, diya ta ya bi pênc wext nimêj, dest bi avdest, dev bi rojî, Roma rûreşi û bextreş rûreşiyên mezin li me dike. Ez xistime kerxana. Navê min wekî jinên li kerxana dixebitin anin ser ziman. Ez li kerxanan dixebitî me dibêjin.
Niha ez ji wî karî teqawut(emeklî) bûme.
Ew ciya ciyekî pir xweş bûye, niha jî xwîşkên te tê de dixebitine.
Em wî karî didin dê û xwîşkên wan êbênamûsan. Mezinê me digotin;
Rom xaîne, Rom rûreşê, Rom bênamuse
Rast gotine lawê min.
Ez bi wan rûreşi û bextreşiyên ku li me kirî neêşîm lawê min
Ez bi te serbilind im, Erdalê min!
Ez diya te me.
Ez diya milyona me
Ez diya şehîda me. Ew merteba herî bilinde ji bo min.
Şehîd namirin
Bijî Sero Apo
Bijî PKK e û bijî ARGK e.
Min ew nivîsa ji bo lawê Kurdî ku roja 29.10 1998 an balafîr ji Edenê revandî revandî Ankerê û ji aliyê dijmin ve bi xwînxwarî hat kuştine nivîsand.

Sema û Erdal  Xalit Oral, îro 28.10 1998 a ye.

Hevalên delal, Hukumata Îtalya (Roma) bi avakî fermî serok birêz Öcalan daweta welatê xwe kirin.





Wiha gotin; «Em dixwazin ji devê wî mêrxazî pirsa Kurdî bibihîzin û guhdar bikin. Hatina wî ji bo me şerefeka mezine».

Roma, Paytexta Îtalya yê. Bajarê alema Xiristiyana yî herî mezin û pîroz e. Neron Roma ji serî de hatanî binî şewitand bû.

Niha Kurd li wî welatî dibin mêvan.

Parlementerekî Îtalî wiha dibêje; *«Pêvajoya ku Kurd tê ra derbas dibin, wekî dema me ya ku Musolîn li me rûreşî dikirî ye. Tirk jî niha li Kurda wiha dikine. Ez ji sedî sed bawer im, wekî em ji Franqo xelas bûn, hûn jî rojekê ji Roma reş xelas bibin. Dawiyê tariyê hertim ronahîyê. Azadî û serxwebûna Kurda ne dûr e. Kurd jî di bin vê rojê ku li rojhilat diqilje û ronahî ye dide, azad û serbixwe bijin. Hêviya me ew e».*

Di aynî rojê de Finlandiya, Bulgaristan, Belçiqa piştgiriya xwe dan xuya kirine. Ukranya, Romanya jî gotin, *«Ew jî bo me şerefeka mezine Serokê Kurdayî netewî bibe mêvanê me. Deriyê hemû sazî û awahiyên me hetanî ber ji birêz Öcalan re vekirine».*


Înşallah ew dewletan yê li ser wan gotinên xwe bisekinin. Lê wiha ne bû.

Parlementerê Yunanî di nav hev da 186 îmze berhev kirin ji bo ku serok Yunanistanê pêşkêş serokê xwe kirin.



Hevalên delal; Dewleta tirk va qirara mehekê devê xwe di Suriyê re vekiriyê. Çi di devê wan re tê wê dibêjin. Ji devê wan jahra marê kur der tê der, ji devê wan gû dibare. Bi Amerîka û Îsraîl ve bûn yek, lingê Suryê kirine soleka teng. Suryê mecburî ma serok ji Suryê bi derxistin. Ji bo ewlekariya wî, em niha nizanin Serokê birêz li kîjan welatî ye.

Lê bi îhtimaleka mezin li **Rusya** yê. Li gor nûçeyên tên guh me. Rusya balfirekê şandiye ji serok ra. Li Qamişloyê li balafirê sîwar dibe diçe Larnaqê, li wir jî firî çû Rusya. Tirkan nedizanî ku birêz Öcalne ê here Moskova yê.



Vê carê jî devê xwe di Rusya ra vekirin û Rusya tehdît dikine.

Sema û birayê Erdal! Îro 01.11.1998 a ye.

Bîst û heyşt parlamenter û mirovên Qominîstên dewletên curbe cur. Partiya PKK e wekî partiyeka cîhanî pêjirandin. Rusya bi awakî fermî serok vexwandin parlamentoya xwe .
Îro Partiya **HADEP** e qongireya xwe bi darxist. Bi deh hezaran welatperaz beşdar bûn. Hemûya bi devêkî û bi dilekî.
HADEP gelê û gel li vir e.
Bijî PKK
Bijî Serok Apo. Ew sloganşn wan hundirê salone dixemilandin. Bi qîrîn û hawar dengê wan di meclîsaTirkan digiheşt.

Birêz Murad Bozlak dîsa wekî serok hat hilbijartine.

Hevala Zîlan û Sema. Bedene ciwan xwe dişewtînin. Lê, wekî min gotî her canek ji wan welatek ê. Her canek ji wan sermayek ê. Ne li girtîngeha tenê agirê azadî û serxwebûne vêdikeve. Li Ewrûpa, Amerîka û Rusya û li her dera ku Kurd lê dijîn vêdikeve.
Girtiyekî li Almanya bi navê Berzan Öztürk bedena xwe agir berda.
*«Bijî serok Apo! Em bi can û xwîn bi te ranî. Kes nikare ku roja me tarî bike. Serok roja me. Ew roj me germ dike û ronahîye dide me».*

Sema û Erdal, îro 03.11 mijdare 98 a ye.

Mesût Berzanî ji Amerîka da hat. Elbet ew nehet Kurdistan e. Ewil ew hat ba dostên xwe tirk peya bû. Ew di ser xaliyekî sorîk re derbas kirin. Wî jî qirka xwe li hewa digirti bû. Du sê rêwebirên MIT e ew pêşwazî kirin. Niha vê carê Mesût here. Mam Celal bê Tirkiyê.



Sema û Erdal, îro 04. 11 mijdar e 1998 a ye.

Hukumata Rusya Duma îro biryarek dîrokî girt. 398 nunerên Dumayê bi îmzeyên xwe pêşniyaziya pêşkeşî Serok dewlet Borîs Yeltsin kirin, ji bo ku serokê Kurda li welatê wan bimîne û bibe mêvan û politiqa xwe bi serbestî bidomîne. Millet Kurd jî bighêje azadî û serxwebûna xwe. (Serok dewletê Rus Boris)



Wekî hûn jî dizanin. Wekî ku serok digotbû: «Em bi hesanî nehat wan rojên girîng. Me pir xortên delal li vê riyê şehîd kirin. Hîng jî em şehîdan didin». Li Seat 12:00 nîvro. Romê reş bi biryar Duma har bû bi çolê ket. Tê bêyî zimanê xwe yî bi çûk daqurtand dibûn, ewqas şok bibûn.
Îro dîsa bi sinyala bernamê Med tv ê asteng dikirin. Deweletên ku lîsansa Med tv e dayî tewanbar dikirin. Ew dewletan li dijî me dijminatiyê dikin. Em ji li dijî wan dijminatiyê bikin.

Îro 05.11.1998 a ye.

Kevirekî giran jî meclîsa Yunanistanê li Roma reş ket. 109 parlementerê Yunaniyê çep û rast. Serokê birêz bi avakî fermî daweta/vexwandin yunanistane kirin. Wiha gotin; *«Em serokê PKK e wekî merivekî siyasetmedar dibînin û dihesibînin û wî vedixwînin welatê xwe»*. Bi vê vexwandine ar û pêtî bi serê Roma reş ketiye. Ji aliyekî ve êrîşa ser Yunanistan, ji aliyekî ve êrîşa ser Suryê dikin û dibêjin, hûn Serokê PKK e diparez in. Serê terore yî li cem we ye. Li aliyê din êrîşa ser Rusya dikin. Wan rojan devê xwe di Îtalyan re vekirine. Dibêjin; hûn cî didin serokê terorista. Em teva kar û barên wê yê hundir dibin û hûn tên pozê xwe di kar û barên me hudir re dikine.
Hevala delal, Mesût hîng li wan derna ye. Ji deriyekî Qonsalosa dikeve deriyekî din. Aman qurban alikariya me bikin. Me ji PKK e xelas bikin.

Îro 07.11. 1999 a ye.

Hevala delal, Serokê KDP e  Mesût Berzanî  îro ji Tirkiyayê çû. Vê carê jî Mam Celal




hat. Wî jî wekî Mesût hesab da û  kevirên di pêşa xwe da li ber Roma reş velo kirin. Îro li rojname Tirkiyê wiha hatiye nivîsandin û pasna **Mesût Bezanî** dikirin. *«Mesût merivekî sergiran û ser nerm û merivêkî siyasemederê. Ew di nav politiqe da pir hatiye ceribandin û dîtiye û derbas kiriye. Wekî bavê xwe».* Ew bi sê tawa derbas kirin. Gotin; ”Birêz Mesût temînat/soz dayê me ji bo ku li hembera PKK e şer bike”.
 Mesût çû vê carê jî Mam Celal hat min go. Gava ku Celal hat wan jî bîstpênç hezar leşkerên xwe şandin Başûr. Ew şandina eskeran bi fermî ji aliyê dewletê ve hat eşkere kirine.  Niha berê operesyonê ber va herêma Soran e.
Hevalên delal, Îro dîsa wekî sala çûyî ku Roma reşî bêbext li me kirî, peneberên me li keştiyeka bi navê Zeynep ê heft roja û heft şeva di nav behrê da gerandin û anîn li kêleka Îtalya bêxwedî cîhştin.

Penebarekî Kurd wiha dibêje. «Perên me hemûya **ji dest** me girtin. Çi zêr û zîv li ser



me hebû hemû birin û em di orta behre da hîştin. Gotin hûn ê hetanî 12 û 13 seata li Îtalya bin. Me li gora gotinên wan bi xwe re xwarin û vexwarin anî bû.
Xwarin û vexwarina me di du rojan de qedî. Lê em li ser behrê bêxwarin û bêvexwarin deh rojan gerin. Bi gerandine em hemû xiş bûn û hal di me da nema. Ji serma em hetanî sibê dimirin. Hineka ji me dixwast ku xwe ji keştiye da bavêje nava behrê. Me pir zehmetî dîtin. ». Roma reş bi wan perên ku ji penebaran distîne fînansa leşkerên xwe dike.

Sema û birayê Erdal, îro 10. 11. 1998 a ye.




Roma reş bi hêzên KDP e ve xwe kirine yek, li hembera PKK e li Başûr şerekî pir giran tê meşandin. Leşkerên tirk her roj bi hovitiyekê êrîşa serê gerîla dikine.
 Gerîlaya Almana Andrea Wolf ku li 24 cotmehe bi şekleka ne însanî hat qetil kirine. Belê rast e. Ew ji ANDREA tirsin ji bo wê, ew kuştin. Gava ku Andrea girtin, ewil tecavûza wê kirin û pişt re jî herdu pêsîrên wê bi kêrê jêkiribûn.
 Ew şehîda Kurdistan ê. Gerîlaya bi navê **Eva juhnke** Romê reş li dadigehê  rezil û rûswa kir.



Got *«Dadgahên we ne dadgehen nûjenin. Dozger û hakime we kevneperest û paşverûne. Hûn Kurda li suk û kolanan bi ro û nîvro dikujin, di îşkencan re derbas dikin. Ez we şermezar dikim».*

Îro 12. 11. 1998 a ye.

Operasyona ku li Başûr dibe bi hemû hêza xwe didome. Va deriyê du mehayê serokên Başûr yek diçe û yek tê Ankerê. Yek li dûv yekî derewa dike, yek di dûv yekî li hev didin û lêdana hev dikin. Gava ku Kek Mesût çû Başûr li rê Gerîlayên qehreman ew pêşwazî kirin.



Mam Celal jî wan rojên ku li Ankerê derbas kirî û temînat dayê tirka û gotiyê; «*Ji min bawer bikin, Kurdistaneka azad di fikra û pêeroja me de nîne*».

Wî jî wek Kek Mesût tirk memnun kirin. Li gor daxwaza tirka şertê ewil li dijî PKK e û bi PKK e re şer bikî, ew şertê tirkayî ewil bû.

Îro Mam Celal derbasî Suryê bû. Piştî du rojan jî derbasî Îranê cem mela bibe. Wî li Ameriqa çi dîtiye û çi kiriye tûrike xwe ji meleyan re velobik, ji bo ku ma meleyên kevneperest alîkariya wî bikin.

Hevala delal, Tu dizanî li welatê me bi wan rewşê wiha re çi dibejin. *«Li sîya kûçika razeyê ezmana temaşe bikî».*

Romêreş ji xwîna me têr nabe. Çete û çutên xwe li hembera gelê Kurd ava kirine. Ji eskeriye da bigire hetanî serokê meclîsê, ji serok komar da bigire hetanî serok wezîr. Van rojan eşkere bû kî serok wezîr bi xwe jî di nav wan çetan da cî girtiye. Lê em çi bikin pîyên me qut in, dinya li me bûye temeşavan.

Ewrûpa dibêje; *«Tirkiyê şerê xwe yî bi Kurdan ra diajo, bi perên Narkotika şer dimeşîne. Narkotika ku tê Ewrûpa bi destê rêvebirên tirk û bi destê qonsolosên tirka yên li Ewrûpa tê. Ew penebarên ku tên Ewrûpa bi destê rêvebirên Tirkiyê tên».*

Erdal, Apê Musê, Kemal, Hayrî, Agit, îro 13. 11. 1998 a ye.

Di dîroka me da, rûpelekî dina nûh dest pê dike. Serokê birêz wiha gotbû;



«Em ji Anqerê derketin bûn partî. Em çûn Rojava bûn ordî û li derwayî welat jî em ê bibin dewlet»

Belê, Serokê birêz îro li paytexta Îtalya ROMA ye.

Împeratorê Roma gotineka xwe meşhûr hebû. «Hemû rê di Roma re derbas dibin, Neron ji bo evîna xwe Roma şewitand» Înşallah rîya Kurdîstana azad jî di Roma yê re derbas bibe.

Îro serokê birêz Apo li Roma û li kêleka serokê elema Xiristîyan Pappa yê. Her du serok jî pîroz in. Îro Roma lawekî Kurdî bi şeref û bi heysiyet, bi namûs, pêşwazî dike. Ew jî Serok Apo yê.

Hatina seroka Romayê Ewrûpa û Ameriqa û cîhan şaş kir. Rojnamevanên cîhane bavulên xwe amede kirine, pênûs û qemerê xwe kirine dest xwe, tên di Roma yê.

Li welatê Roma reş şîn heye. Roma reş ketiye qome, serxweş bûye bi hatina seroka Roma yê.

Ez bawerim Romêreş vê carê nikare ku asteng derxîne pêşiya me. Ew gotineka me Kurda heye dibêjin. «Pînê biçûke lê qûlê mezine». Ev pîna ji vê qulê ra êdî nabe.

Lê dest bi şerê psîkolojik kirine. Gava ku serokê birêz hat Roma yê.

Serok wezîrê Tirkiyê Mesût Yılmaz wiha got,« Me serokê PKK e girt. Ew mesela xelas bû. Pîroz be li me hemû ya. Mizgîn ji dayikên şehîdan re, me Apo girt. Polîsê me yî qehreman, ew here kê derê dê wî bigirin. Me soz dabû dayikên şehidan, em soza xwe tînin cîh».

Medya ji her deqiqa careke weşanên xwe du car û sê car dikin. Me Apo girt. Sê û çar seat ketin navbera. Ji devê berpirsiyarên Îtalî. ”Tirkiyê derewa dike. Serok Apo li ser daxwaza serokê Îtalya birêz Massimo D’ allema hatiye Îtalya. Serok Apo mêvanê me ye. Apo ne hatiye girtine. Ew î niha li nexwaşxane ji bo tendûristiya xwe muayene dibe. Meriv mirovên wiha yê hêja nagire û ê pêşwazî bike”.

Roma reş bi wan daxuyanana şaş û mat ma. Nizanin ku çi bikin.

Apê Museyî delal! Gotineke xwe hebû digot;*« Lawê min, bi tirka û yên ku bi wan re li ser sofrê re rûniştî bawer nekin. Ev yek segên reş in»*.

Apê Musê rast gotiyê; Yunan jî pir bi Romê reş re li sofra rûnişt û hînî şeytanî wan bû, lê me ew wekî dost dizanî, lê dostê me sextekar derket in. Ma canê gelê Yunanî sax be. Ez naxwazim li ser vê bûyarê ku bûyî bisekinim.

Hevala delal, Masmedya Roma reş dest bi derew û rûreşiyên sextekariy dikine. Hevalên me ew ji meydana Çeliyo biderxistin. Rojnamvanên Romê reş wek gurên reşê dev bi xwîn, li ber balyozxana xwe bi derewa nûça didine gelê xwe.

Lê min gotibû; Van mîna segên ku boça xwe kirî nav ranê xwe, kêr devê wan venake.

Hevala Zîlan û Sema, gelê Kurd bi evîneka mezin li serokê xwe xwedî derket û derdikeve, ew di hembeza xwe da parazt in. Li her deverên cîhanê gelê Kurd li erebên xwe li balafîran sîwar bûne ber va Romayê tên, têm serdana cem serokê xwe. Li wan seat an bi deh hezaran welathez di greva birçî bûne dane. Serok Apo jî di greva birçî bûne daye.

Li welatê Roma reş girtiyên me bedenên xwe ku xwîn tê da nemayî, bedenên xwe ku dijmin xwîna wan mîtî bi agirê serxwebûn û azadiye dişon. Serok Apo dibêje, ez ê laîqa wan bibim.

Îro 15.11 98 a ye.

Îro Serokê birêz Öcalan ji mêvanxanê birin nexweşxanê li gor gotinan li wir tendirûstiya wî qontrol bikine. Gelê li meydana Celo vê carê jî dû serokê xwe rabû çûn ber nexweşxanê. Hêjmara welatparêzên ketî greva birçî bûne, gehştê danzde hezara. Birêz Öcalan wiha got: «Qirîn û hawara we piştgiriyê dide min»



Hevala delal, Ne bi tenê li Ewrûpa li bajarê me yî dîrokî Silemanyê bi hezaran welet parêz ketine gireva birçî bûne.
Li Misirê, welata fîravûn, bi dehan xortê Kurd li ber zanigeha EL EHZER e ketine greva birçî bûne.
Li welatê Roma reş 10 hezaran girtiyê PKK e û hevalên wan yên din jî ketine gireva birçî bûne. Kurd bûne agir, Kurd bûne lêhî li berxwe didin. Dostê Kurd rojnamevan Dîno ji deriyê avahiyekê diçe ber deriyê avahiyeka din. Dîno ji bo rewşa serok gelê Îtalî û gelê cîhanî agahdar dike.
Dino dibêje; «Ez deyndar im, deyndara girtiyên zîndana Amedê me. Min soz da wan ku ez bibim dengê wan. Ez niha deynê xwe didim». Dîno xwe daye kêleka serokê birêz rewşa cîhane tev hev şîrove dikin.
Hevala Zîlan û Sema; em herin kê derê Roma reş ji pistê me nabe. Serok Öcalan ewil hat Rusya yê.



Parlementerê Rus qimeteka mezin dan wî. Dostê me Rusî xwastin ku ma serok li welatê wan bibe mêvan. Lê Romê reş bi hevkarên xwe Îsraîl Amerîka ve dewleta Rusya bi aborîyê çav tirsandin da. Niha aboriya Rusya gelek di rewşeka pir xirab dayê. Van wê wek qoz bi kar tînin. Ne tenê çav tirsandin, ewqas tengasî derxistin ku tengasiyên ku nayên aqilê merivan. Serok mecbûrî ma, derbasî Romayê bû. Dostên me Yunanî piştgiriya Roma kirin.

Îro 16.11. 1998 a ye.

Gelê me li meydana Çeliyo diqîre. ”Tu ne bi tenê yî serokê hêja ! Em bi can û xwîn, hetanî mirinye bi te rane. Destên ku dirêşa te bibin, em ê bişkenin”.
Polisên Roma yê agahiyek da rojnamevana wiha got; «Hetanî roja îro 36 hezar Kurd ketin Romayê û bûn mêvane meydana Çeliyo»





Saziyên Romayê sivîl jî alikariya û piştgirîya girev didin çalekvanan. Ji parlementeran da bigire hetanî karkera û gelê Îtalî keç û xort tên serdana çalakvana. Gelê Îtalî dibêjin; « Roma niha Paytexta Kurda ye» Cîgirê wezîrê Edaletê parêzgeriya serok girtiye ser milê xwe.
Nizanim rewş çi bibe? Hetanî roja îro rewş baş diçe.
Hemû Kurd bi nêzik bûna hikumata Îtalya ya ji bo pirsa Kurdî û pirsa serok me kêfxweş dike.
Lê meriv nizane çi bibe! Gurên ku postê berxika di xwe werdayî ketine dûv serok. Ew gotinek heye; «Dibêjin şev yeke diz hezara» Di bin şevê re li dijî serok gelek danûstandin pêk tên. Amerîka, Almanya, Rusya û dewletên din hewl didin ku ma serok bê girtin. Em niha ketin pêvajoyeka gelek hassas. Yanî mirin û mayîn e.

Îro 16/17.11. 1998 a ye.

Dilê me dişevitê, kezaba me agir pêketiye, va 70 sala gelê Kurd di bin zor û zûlma



Roma reş daye. Êdî dem hatiye, xort û keçên me vê zûlme qebûl nakin. Îro li paytexta Rusya Moskovayê du xortên genc agirê azadiye bi canê xwe xist in. Ji yekê îlonê da hatanî roja îro 23 kesan xwe ji bo serokê xwe xwe şewitand in. Ew şehîdên me bi rûmet in. Roniya çavê gelê xwe ne. Ahmet Yıldırım, Remzî Akkuş. Ew herdu lehengan bi giranî birîndar bûn, ji bedena wan sedê 75 şewitibû. Ez ji we re qala wan herdu mêrxazan bikim, ka bi kîjan ceseretê(dilaweriyê) xwe şevitandine. Li gor wêneyên me li MED tv e û televizyonê cîhanê temaşekirî û dîtî.
«Sibê roj hîng bi bosteke di ser Moskova yê re hilnehatiye. Du xort bi gavên ewlê bi serbilindî, egît hatin meydana **Sor**, kêleka **monzola Lenin**. Hev du merheba kirin û xatir ji hev xwastin. Gotin sonda me bi walat e. Daxuyaniya niviskî dan kêleka peyarê (qaldirim) bidonê benzin bi ser xwe de rijandin. Di kêleka wan re otomobil derbas dibûn. Şoferê otomobilê bi diqet li wan dinêrî. Yek ji wan bezî kêleka peyarê, hestê ji erdê girt û li hev dîsa mêze kirin.
Bijî gelê Kurd û serokê gelê Kurd Öcalan.
Piştî vê siloganê agir berdan canê xwe. Him dişevtîn, him jî diqirîn di gotin, bijî PKK e, bijî Apo. Erebek hat li kêleka wan sekinî, şofer betaniya bin xwe avête ser wan û ew vemirandin. Pişt ra ambulans hat ew birin nexweşxanê. Ew bûyara hemû cîhanê temaşe kir.
Lê, nizanim niha tendûristiya wan li kîjan pîlkeyê/derceyê.
Em spas dikin ji hukmata Romayê re. Bi her curê pişt giriye didin serok Öcalan, di




serî de serok wezîr Masimo Delema. Serokê PKDW Yaşar Kaya xwe daye kêleka serokwezîr. Rewşa dinyayê û buyerên ku diqewîmin û yên ku bênqewîmine şîrove dikine. Massmedya cîhanê ketine dore ku bi serok Öcalan re hevpeyvîna çê bikin. Televizyonên cîhan hemû jî hatin ber avahiya ku Öcalan tê da û bi birêz Öcalan roportaje bikin. Televizyonên Îtalya bernamên xwe nîvî bi nûçeyên ku li Îtalya dibin û cî dide nûçeyan Öcalan û Kurda. Televizyone Îtalî bi navê REIDU.
Bernameka teybetî îro weşand.
Nêzikî 200- 250 kesî navdar daweta vê bername kiribûn. Bi tipên mezin; **CURDI**. Li bin vê nivîse wêneya serok û di destê wî da çek. Wekî gerîlakî zindî çê kiri bûn. Elbet medya Tirk bi wan bernaman û bûyarana har dibine. Ji her deqiqa careke nûçêyeka dawî didin weşandin. Her carê derew û rûreşiyeka xwe dikin.
Pîs Îtalî! Duh Yunan bûn, îro jî Îtalya.
Tiştên/dezgeyên Îtalya protosto dikine û tiştên wan li derva velo dikin û dişevtîne. Bi gelê xwe re dibêjine, cilên Îtalya nekirin û wan bişewtînin. Cilên Îtalî protosto dikin û dişewtînin. Ji zarokên heft salî bigire hetanî yên heftê salî, ji devê wan gû dibarî. MHP e faşistên xwe jî kiri bûn dewre. Wekî kûçikên bîn genî dev diavêtin dor paş xwe. Kîjan Kurd bi destê wan diket an di kêleka wan re derbas dibû ew birîndar dikirin li wî/wê didan. Û êrîşa wî/wê dikirin. Êrîşa esnafên me li Stanbulê dikin. Lêxin ew jî terorîst in dibêjin.

Serok wezîrê Tirkiyê deh caran nota da dewleta Îtalya. Alên Îtalya û alên PKK e, ERNK e dişewtînine. Êrîşa ser avahiyên HADEP e dikin. Bi seda kesên welatperez girtine bin çava.

Hevala Zîlan û Sema û Ahmet Yıdırım û Remzî Akkuş, îro 17. 11. 1998 a ye.



Romê reş har bûye nizanine çi bikin li hemberi hevalên me. Îro li Hekariyê keçeka bi eslê xwe Ereb li navça Hekeriyê xwe di dilê dijmin da teqand, du serleşker kuştin û deh leşker xeter birîndar kirin. **FATMA ÖZEN( Rojbîn Avanos)**

Fatma Ozen, Rojbin û Ahmet Yıdırım û Remzî Akkuş, îro 18. 11 .1998 a ye.

Bi hezaran Kurd li meydana Celo di gireva birçî bûne dane. Govênd tên kişandin, stranên tên sirandin, di nav Kurda de kêf û şayê heye. Bi hatina serok Öcalana Îtalya gelê Kurd ji kêfan re serxweş bûne û her der dikele. Lê, carcara tiştên ku serok naxwazin jî dibin, em çi bikin ew ne bi destê me ye, hevalekî agir berda bedena xwe. Ez dijmin protosto dikim, Zülkif Yılmaz. Serokê Îtalî wiha got:



« Masimo D'alema, em dê bi gelê Kurd ra bin hetanî dawiye. Em dê we bi tenê cî nînin».

Gava ku wan bûyarna dibûn, xebera şahdeta hevalê Remzî Karakuş û Ahmet Yildirim ku xwe li Moskova yê şewitandî hat. Ev welat parezên di gireva birçî bûne da hemûya bi devekî û bi dilekî gotin şehîd namirin, em bi te ranî hevalê Remz î.

Hevalên delal, li her deverên cîhane Kurd di nava çalakiyan dane. Ji Misir bigirê hetanî welatên Îskandinav ya yê. Dostê me rojnemêvan jî bi serok Çelo re kete gireva birçî bûne.

Zülkif Yılmaz, Rojbin û Ahmet Yıdırım û Remzî Akkuş, îro 19.11. 1998 a ye.

Romê reş bi hûrik û çûçikên xwe ve rabûye ser piya şerekî psikolojik li dijî Kurda dimeşînin. Bi kolan û sukan ketinî wek kûçikên harê dev bigiliz, nêçira Kurda dikine. Hedefa wan a herî pêşin avahiyên HADEP û saziyên Kurda ne. Êrîşa ser dikanên Kurda dikine. Hetanî roja îro bi hezaran nûnerên HADEP e hatin binçav kirin û girtine û wan di îşkencê mezin re derbas dikin. Ez nizanim wan bûyarên ku diqewîmin dilê Şemdîn Sakik xweş dikin an diêşînin.



Polîsa xwe avête ser avahiya HADEP e li Amedê, bi daran, bi hesinan, bi qalasan li merivên di avahiyê de kar dikin didan û dan. Ew ji miriniyê xelas bûn.
Bi sedan kes birîndar bûn. Xortêkî Amedî bi navê Hamit Çakir bi wan êrîşên polisê faşist şehîd ket.

Li **Kutahya** xwe avêtin ser mala bavê Rozerîne, AYFER KAYA. Rozerîn keça gerîlaya ku bi serok re ji Rusyayê hatî Îtalya. Dibêjine ev dosta Apo bûye. Êrîşa ser mala bavê wê kirin û hatin dê û bavên wê jî girtin binçava bi rojan îşkence li ser wan kirin.



Zülkif Yılmaz, Hamît Çakir Rojbin û Ahmet Yıdırım û Remzî Akkuş, îro 20.11 1998 a ye.

Dilê Kurda îro li welatê Îtalya ye û li paytexata alema Xiristiyana davêje. Di serî de



gelê Îtalî û serok wezîrê Îtalya Massimo D'alema îro li parlamento û dadigehê biryaraka dîrokî bê dayin. Li cem mirovatiyê mêvanatî tiştekî pir giran û qedir bilind e. Gava ku serok Apo hat Îtalya ew bi dilxweşî pêşwazî kirin.

Lê nizanim ji biryara dostên me Îtalî çi derkev e?! Li gora reya me kurda, ew ê birêz Apo li ba xwe bikin mêvan. Ji bo wê biryarê ji aliyê dadigehê parlamento da bê dayin, bi milyonan dilê gelê Kurd diavêje, guhên xwe li ser dadigeha Îtalya yê. Ne Kurd tenê hemû alemê guh xwe dane ber biryara Îtalya. Min go hemû alem. Lê elbet tirka, Farisa û Başûrîyan, Amerîka û dijminên PKK e guhê dane ku ew birêz Öcalan bigirin û bişînin Tirkiyê.

Seat 12.00. Îtalya biryara xwe da. «Mêwanê me yî ezîz li cem me bimîne. Em



naxwazin serokê Öcalan bi dest Roma reş din. Me jî wekî Kurda ji ber faşizma Franqo pir kişand. Bi milyonan gelê me li der û dorên Ewrûpa bûn penabar, perîşan bûn. Em dibînin, hûn jî wekî em perîşan bûne. Bijî gelê Kurd û serokê wan Abdullah Öcalan»

Hevala delal, bi vê bîryarê erênî çil hezar kes li meydana Çelo ji eşq û kêfan re girî. Viva Îtalya!, Viva Massimo D'alema!. Viva Gelê Îtalî!. Bi êşq û kêfxweşiya Kurda her



der hêjiya. Roma reş kete avahiya balyozxanên xwe deng ji wan derneket.

Li ser rûyê cîhanê her gelekî rojên xwe teybetî hen e. Lê me Kurda ji xeynî 21 adarê tu rojên me teybetî tunen. Gava ku hereketa PKK e dest bi serhildanan kir. **15 tabaxe 1984** an ji me re bû rojeka serhildan û bû hêviyeka mezin, rojeka taybetî. Gelê Kurd ew roja wekî destpêka xelas bûne gelê Kurd qebul kir. Îro jî 20 mijdare, Va roja jî ji me re biqasî roja 15 tebaxê pîroz e.
Hevalên delal; Bi vê biryarê Romê reş dîn bû. Çi di devê wan re dihat ev bi Îtalyan re digotin. Ji dîn bûn har bûne re êrîşa ser gelên Kurdî li metrepola dikine. Dikan û kargehên wan dişewtînine. Rûreşiyên û îşkencên mezin li wan dikine.

***Îro pênc Qardînalên Pappa ji bo Kurda dua kirin. «Xwedêo tu gelê Kurd ji bindestiye rizgar bikî». Li wan seatan serokê hêja ji nexwaşxane derxist in, birin di malîkxaneyeke da bi cî kirin.
Hevala Zîlan, Roma reş berê li ser gelê me tedayî zûlm bi dizî dikir, êdî îro nehewceyê ku wê bi dizî bike. Ew êdî wê eşkerê li kolanan û sûkan meriva digirine û

dikujine. Nêzika 2000 kes girtin bin çava. Şerekî nav xwe yî dest pê kiriye. Faşistên tirk kolan bi kolan digerin, dibêjin ma Kurd ji nav me derkevin, her in cem serokê xwe. Em wan naxwazin. Va welatê me. ”Li wî welatî ji tirkan bêtir tu gelên din ê dijîn tunen”

Hevala delal, Îro serokê HADEP e birêz Murad Bozlak bi hevalan xwe ve hemû avêt

in girtingehê. Ma tu dizanî Romê reş wan mêrxazan bi çi suçdar dikine?
Serdozger dibêje; ”*Ew ala ma ku we bi dîwerda zeliqandî bê ûtî bû ye. We bi zanistî ew ala qerçimî bi dardakiriye. Ji bo wê ew avêtin girtingehê”.*

Ahmet Yıdırım û Remzî Akkuş îro 21.11. 1998 a ye.

Dewleta Roma reş her roj hovitiyeka din li ser gelê me plan dikine. Faşistên xwe mîllî hemû sefer ber kirine, li kolanan nêçira Kurda dikine.



Îro jî dayikên şehîdên xwe feqirê belangaz kirine kolanan û ew êrîşa ser Kurda û avahiyên Kurda dikine. Ew bûyarên ku diqewimîn hemû bi plan û program çê dibine.
Polisa êrîşa ser avahiya HADEP e kir. Welatparezekî bi navê Metin Yurtsever qetil kirin. Ew kesên din ê di avahiyên da jî dan ber ço.
Li Kutahyê malê bavê Rozerîne kevir kirin, derî û cam li wan şikenandin.
Hevala Zîlan û Birayê Metin; Roma reş çi dike bila ma bikin. Hûn şehîdên walat me ne û rûmeta welatê me ne. We bi mêrxazî li hembera wan panzde salan şer kir.
Birêz Massimo ji serokê hêja Apo re malîkxanek tesîs kiriye. Bi sedan rojname li ber derî civîne ku bi wî re hevpeyvîne bikin. Li li aliyê din 13 partîyê û rêxistinên Kurdên Başûr û Bakûr hatin cem hev dilsozî, piştgirî dan serokê birêz. Dîsa li Başûr bi sedan rewşenbir û munewerên Kurd piştgiriya serokê birêz Apo kirin. Ne ku her tim tiştên wiha yê baş dibin, tiştên ne baş jî dibin.

Ahmet Yıdırım û Remzî Akkuş û Metin Yurtsever, îro 22. 11. 1998 a ye



Roma reş dest bi operasyoneka mezin kiriye. Bi deh hezaran esker berva Başûr diçen. Mesût jî dîsa rûyê xwe yî reş nimand. Bi Roma reş re digel hev êrîşa ser PKK e dikine. Tabî kî hevalê bersiva wan dan, ma tu gumanên we ji vê tune bin.

Remzî Akkuş û Metin Yursever, îro 24.11. 1998 a ye.

Belê hevalên hêja Romê reş bi çalekî û şerê we ketiye qom e. Diçin kîjan derî ew



deriya li ber wan tê girtine an li suretê wan dikeve û paşve vedigerin. Ew tîrên/derba ku Îtalya li wan xistî, hîng tirk heşara xwe nebûne. Kurdên ku hatî binçav kirine hêjmara xwe gehştê 3075 kesan.
Li van rojên pêş me de di navbera Îtalya û Tirkiyê de girîk musabaqa Fotbolê pêk bibe, *”Îtalî dibêjine, em nawerin biçen weletekî wiha yî Faşistî ku lê şer dibe”*. Bi şekleka resmî ser li UEFA dan û UEFA ew daxwaz û serlêdana wan di cî da dît, musabaqa heftekî paşva hat xistin. Lê vê carê jî Roma reş êrîşa ser saziya UEFA kir.

We merivê ku 30.000 zarok û mahsum kuştî, we di hembeza xwe da veşartiye û bi me re jî dibêjine, li welatê we şer dibe.

Îro Sosyalist Enternasyonalist li Ewrûpa civîna xwe pêk tîne Erdal Înonû jî Tirkiyê temsil dike, hemû nûnerên sosyalîst Enternesyonalîstê tirk ji bo vê rûreşiyê li dijî Îtalya pêk tê tevanbar kirin. Erdal Înonû qet ji ciyê xwe rane bû. Mîna merivekî suçdar di ciyê xwe da rûnişt. (Foto Kurê serok wezîrê Tirkiye yî kevn Îsmet Înonû ye.)



Hevala Zîlan, Ew gotineka pêşiya heye; «Kergû li çiyê xeyidiyê xebera çiyê tune bûye». Tirk jî li Ewrûpa xeyidiye û xebera Ewrûpa tune bûye. Şelmaqek jî ji aliyê Sosyolist Enternesyonalist li Tirka ket.

Remzî Akkuş û Metin Yursever, Metin Yursever, îro 25.11. 1998 a ye.




Serok wezîrê Îtalî birêz Massimo D'alema dera gerek derva dikeve ji bo rewşa birêz Öcalan.
Va pirsa dê çawa çareser bibe?

Pêşî çû serdana serok wezîrê Alman Schorder, ji bo çareser kirine Almanya ne got er e, ne jî got na, di gotin di navberê herdu levên xwe girt.



«***Pirsa Kurdî pirseka girane, lê wan rojên pêş me em ê biryareke bistînin. Em Îtalya bi tenê cîh naynin û wan nakin tengasiye***».

Mijar ji ser xwe avêt. Fransa Jacques Chirac jî wekî wan daxuyaniyek da. Welatên din e Ewrûpa jî yek kêm û yek zêde wekî şîrovên hevalên xwe bûn.




Jina Miterand Xanim Danyel Miterand, piştgiriya xwe bi dilsozî da û wiha got; *«Êşa gelê Kurd û gelên belangaz tim di dilê min da raza yê, lê Pirsa Kurda û êşa Kurda ciyekî xwe yî girane di dilê min da heye. Birêz Abdullah Öcalan ciyê kî xwe yî teybetî heye di dilê min de»*



Hevala Zîlan, Îro hikumeta Tirkiyê 55 an jî îstifa kir. Serok wezîr Mesût Yılmaz jî ji dewletê dizî kiriye û bi çetan re alîkarî û piştgiriya wan kiriye. Ew dera orte ket û eşkere bû. Ji bo wê mecbûr ma îstifa kir.

Birêz Öcalan wiha digot «Hetanî pirsa Kurdî çarê ser nebe kîjan hukumat tê bila ma bê, temenê xwe ji şeş meh salek ne zêdeyê. PKK e agire, ew agira yê wan jî bişewtîne».



Hevala Zîlan û Sema; Îro serokê birêz li Paytexta Îtalya daxuyaniyeka pir mezin da çepemeniya cîhanê, bi sedan rojnamevan, nûçêvanên TV e hatibûn vê civîne.
Wiha dest bi axaftine kir; «Ev destê agirbestê yî ku me li yekê îlonê direşa Tirkiyê kirî, hîng jî me dirêj kiriye. Em li ser soza xwe nî. Em dixwazin vê pirsê bi şekleka aşitî çareser bikin. Êdî bes e, her du aliyan jî şehîd pir dan. Wî şerî qirêj em bidin

sekinandine. Ez li vir dîsa destê xwe yî dinî aşitiyê dirêşa Tirkiyê dikim, werin em li maseke rûnin vê pirse çarê ser bikin. Em tu tiştên pir ji we naxwazin. Em tu sînora bi we nadin kêrî kirine.(perçe)
1-Ew operasyonên ku li hembera me û gelê me tên meşandin bila bên sekinandine.
2-Ew gundiyên me ku we bi darê zorê ji gund û zozanên wan bi derxistî, ma dîsa vegerin gundên xwe. Dewlet bi wan re alîkariya aborî bike.
3-Cahştiye(korucitiyê) ji ortê rakin.
4-Di nav sînorên Tirkiyê de Otonomiyeka biçûk.
5-Hemû mafên demoqratikê ku gelê tirk xwedî, divê gelê Kurd jî bibe xwedî.
6-Nasnama Kurda bi awakî resmî bê naskirine. Kurd bi azadî karên xwe çandî û perverde bûne bikin.
7-Li Tirkiyê ji kîjan milletî dibe bila ma bibe, ola xwe bi azadî bike, tu astengî li wan nayên kirine. Îro pir gelên Anadoliyê ji wî karî mahrum in.
Ji xeynî wan daxwazên min, ez ji dewleta Tirkiyê tiştî din naxwazim».
Rojnamevanekî pirsî;
- Birêz Abdullah Öcalan tu bi rastî wan gotinên û daxwazê ku tu dibêjî, pê me û dinyayê dixapînî an zatên tu wiha dixwazî.?
- Ez bi rasatî û bi dilekî pag wan dixwaz im. Eger ku min ji xeynî van daxwazan tiştekî din xwast, ez ne merivim.
Em vê ji bîrnekin, ev daxwazên min di bin sîwana qomisyonekî Ewrûpa da pêk bên.
Ez soz didim we û cîhane, ez ê destî xwe ji her tiştî bikşînim.
Spas.

Metin Yursever, Ahmed Yıldırım û Remzî Akkuş,  îro 27.11. 1998 a ye.




Bîst salên ji agir. Îro gelê Kurd bîst saliya partiya xwe pîroz dike. Serok Öcalan wiha gotıbğ; «Va rojê pîroz,  li we û li şehîdên me pîroz be»  Ew pîroz bihaya li welat, li dervayî welat bicoşeka pir mezin tê pîroz kirine. Ew zûlm û zordariya ku li gelê Kurd bûyî ji aliya qadro û welatparazên Kurd ve tê nalet kirine.

Metin Yursever, Ahmed Yıldırım û Remzî Akkuş, îro 28.11. 1998 a ye.



Rewşa siyasî ji bo serok Öcalan baş diçe. Piştgirî ji herderên Ewrûpa tê. Lê nizanim ew piştgiyeka raste an bi derew in. Dewletên Ewrûpa gelek cara li me Kurda îxanetên giran kirin. Serê wan îxanetan jî Almanya û Îngîlterê dikşandin. Bi girtin û zîndanan xwastin  me PKK li ya terbiya bikin, lê Apocî terbiya nebûn. Ew bi serokê xwe bi partiya girêdane. Gotin duh îxanet hebû, lê îro nabe.
Ji vê daxuyaniya  şûnda piştgirî hê zêde.

Nûnerên PKDW e bi şev û roj dixebitine ji bo diplomasiyeka baş.
Serokê PKDW e Yaşar Kaya bi dilê xwe yî ku ji deriyekî diçe berderiyekî. Ew di xeberdaneka xwe MED tv e de wiha dibêje; «*Xweskek Apê Musa van rojana bidîtiyan. Me destên xwe di destî hev kira, li kêleka malîkxana Apo rûniştanî û dîroka xwe ku bi xwîna me hatî nivîsandine di ber çavan re derbas bikira*». Bi rastî Roma reş di qome daye. Heroj êrîşa ser avahiyeka Kurda dikine. Gotinên nexweşê li ser rûyê cîhanê nemayî bi serok Apo re dibêjine. Ma bêjin, şorê xeraba ya li xwediyê xwe veger e.




Em bên ser mijara xwe. Dostên me Îtalî wekî rojnamevan **Dîno**, wekî **cîgirê wezîrê Edelet ê**, parlementerê partiya Qominsta Wiha dibêjin; «Ne hewceyê ku Kurd parlamentoyekê xwe avabikin.  Parlementoya me ji wan re her dem amede vekiriye»
Ez ji te re qala wan dostên me ku çûyî serok ji Rusya anî bikim.
RAMON MANTOVANÎ :




Parlementerkî Îtalî ji partiya Qminîsta yê. Li ser daxwaza birêz Massimo D'alema li balafireka pirivat sîwar bû çû serok ji Moskava yê anîn. Li cem xwe kirin mêvan.

LUIGI MANCONI
Parlementerê keska, sponsariya serokê birêz dike.

OLIVIERO DELBERTIO
Parlementerê Qominîstayî, wezîrê edeletê, ji bo ku serok serbest bê berdane, pir hewl dide.

PAOLO GUERRINI
Parlemterekî qominîstî, mûsteşarê wezîrê paraztine, heyrane serok Apo ye.

PIERE PAOLO CENT
Parlementerê keska. Eger Îtalya penabaritiya serokê birêz Apo ne de, ez soz didim ez dê dı gireva birçî bûne kevim. Wiha bi dehan kesen bi nav û deng, piştgiriya serok dikine.
Di rojnamê da wiha dinivsîne, Yaşar Kaya gotiyê *« Parlementoya Îtalî mala me ye»* Hema li kêleka wê nûçê, Tirkiyeyê dixwaze bi rêya rojnamên Îtlalî daxuyaniyên xwe bi weşînin. Lê Rojnamên Îtalî mesajên Romê reş li rojnamên xwe neweşandin. "Rûpelên rojnama me tijîne li qusurê nenêrin". Ew bi vê gotinê ji ser xwe avêt in.
Hevala Zîlan; Derbê li ser derbê li Romê reş dikivine. Îro hevalên te, şervanên serê çiya helîqopterek din ji ezmanada rûxandin. 17 kes tê da hebûn, hemû mirin. Ew şaş bûne bi vê çalekiyê çi bikin ş bêjin. Eskerî erkan hema li hev civiyan rewş tehlîl kirin. Lê gava ku civîna wan bi dawî bû. Li gelek bajarên Kurda êrîşa ser gelê sivîl kirin. Dîsa wekî berê bi derew û vira gotin, ew helîqotera ne ji aliyê PKK e ve hatiye rûxandine, li ezmana Motorekî wê ariza kiriye. Ji bo wê helîkoptera me hatiye rûxandin. Derweka bi boç !



Ev ne derewa wan a yekeme. Carna dibêjin, heliqopter li stûnekî elektirikê ketiye. Carna dibêjin li ezman qîjqîjikek ketiye eksozê helîqopterê ji bo hatiyê rûxandine. Êdî millet bi derwên wiha bawer nakine. Ew mecbûrî dibin li xwe tenîn dibêjin terorîsta rûxandiye.

Metin Yursever, îro 04/12 1998 ana e.

Bedenên ku xwe ji bo dilsoziya serokê xwe dişewtînin berdewam e. Îro jî li ser sûrên



Amedê xortekî xwe şewitand.

Ew agirê ku li Amedê pêdikeve pêtiya xwe dide hemû Kurdîstanê. Gava ku li Amedê va çalakiya bû. Li Bajarê Almanya li ber Balyozxana Tirkan xortekî bi navê Hesen Taksim xwe bi agirê azadî û serxwebûne şoşt. Ez ditirsim ew şewatan pir bibin. Xortên me ter û teze xwe dişewtînin.

Li aliyê din Humana watch right rapora xwe salê weşand, dinyayê da dewleta Roma reş bi talan, îşkencê, ledana di reza duyem da cîyê xwe girtiye. Di reza yekem da, Colombiyaya faşist heye, li wir jî wekî gerîlayên me FARC hene li hembera ABD û Hukumata Colombiya şer dikine.

Metin Yursever û Hesen Teqsim. îro 3. 12. 1998 a ye.

Hevalên delal, Îro şaredariya Îtalya bi hemû nunerên meclisê xwe ve biryarek girtin.



Ew meydana wan hazar sala ku bi navê Çeliyo hatî nav kirine, îro navê wê meydana guhertin, kirin Meydana KURDISTAN. Dostê me Dino bi destên xwe ew levha bi dîwer da zeliqand.

Gelê Îtalî bi gehştî piştgiriya serok Öcalan dike. Pîrek wiha dibêje *«Em serokê Kurda ji emperyalistan re nakin yem/êm»*

Metin Yursever, Îro 6.12. 1998 a ye.

Agirê azadî û serxwebûne îro ji girtingeha Batmanê bilind bû. Keçeka welatparêza bi navê Gulistan Taş agir bi bedena xwe xist. Lê dijmin ew nebirin nexweşxanê, ew bi wan birînan xeter dîsa avêtin quncikekî girtîngehê. Birînên wê hevalên wê derman kirin.



Belê Rojhilat dikele. Mezra Botan dişewitê. Dijminê me har bûye, nizane çi bike. Serî li hemû wehşetan têxîn e. Lê tu tişt di destê wan re nayê.

Metin Yursever Gulîstan Taş, Îro 07. 12. 1998 a ye.

Serokê birêz Abdullah Öcalan li Paytexta Îtalya li benda alîkarî dostên me. Parlementoya Ewrûpa îro ji bo mijara serok dicivê ji bo rewşa serok biryareke bide. Ez nebawerim tiştên bi xêr û silamet ji vê dera pêş kev in. Hêzên neyar xwe gihandin Îtalya. Serokwezîr Massimo Dalema hîşyar kirin.



Îro welatparêza li hemû avahiyên HADEP e dest bi greva birçî bûne kirin. Lê serokê HADEP e birêz Murad Bozalak di zîndana Tirkan daye, wî jî ew biryara gelê me di cî da dît û ez li vir piştgiraya we dikim.

Metin Yursever û Gulîstan Taş, îro 8.12. 1998 an e.



Welatparêz ku li paytexta Rusyayê ji bo serok Öcalan gair bi bedena xwe xistî Ahmet Yildirim ew jî îro jî şehîd ket . Ew nîha mêvane we. Silavên serok jî şehîdên me re hen e. Serokê birêz wiha dibêje: *«Ez ê laîqa şehîdên bibim. Ew canê xwe ji bo Azadî û serxwebûna gelê xwe didin»*.

Ahmet Yıdırım û Remzî Akkuş û Gulîstan Taş, Îro 10.12. 1998 a ye.

Deh qanun ê ji bo gelên bindest rojeka taybeti yê. Li deh qanune 1948 an da belovoka mafê mirovan ji aliyê YN ve hat qabul kirine. Bi sedan dewleta binê wê belovoke îmza kirin ku em ê di çerçeva vê peyman û belovokeda biminin û mafê mirova biparêz in.
Di vê belovoke de Îmza dewleta Roma reş jî hebû.
Warê! ka Romê reş di wî pênce salî da çi aniye serê gelên di nav xwe de dijîn. Pênce salê ku wan gelan bi taybetî me ji zindaneka xwe davêje zîndaneka din, ne pirs û ne jî bersiv. Tu Kurdî bes e.
Serokê mafê mirovan dan ber guleyan, ji ber ku ew dostê Kurda yê û mafê Kurda diparêz e. Bi sedan endamê mafê mirova avêtin zindana.

RAPORA ROMÊ REŞ

Ji sala 1994 an da hetanî 1997 an.
Faîlî meçhulê..........1578 mirî, 182 xeter birîndar û seqet mayî.
Binçavanda hatî kuştin.................................................724
Yên ku di nav şerda hatî kuşt in(çatişma) ....................14267
Çalekiyên li hembera sîvila hatî kirine 958 mirî û 1267 pir birindar
Yên ku girtî binçavan û di binçavanda wenda bûyî........ 808
Yên ku îşkence û tedayî dîtî..........................................3124
Yên ku hatî binçav kirine................. ..........................76688
Yên ku hatî girtine.......................................................6654
Gundên ku hatî vala kirine...........................................1834
Ciyên ku hatî bombe kirine...........................................611
Komalê û sendiqayên ku hatî girtine..............................508
Rojnamevanên ku hatî binçav kirine...........................1180
Nivîskar, rojnamevan û zanayên ku ji bo ramanên xwe di girtingehê de 466

Hevala Zîlan û Sema û Dayika delal Hatîcê Falay, Îro 13. 12. 1998 a ye.

Dayika 65 salî bi navê Hatîcê Falay xwe şewitand û bi wê jî nema xwe ji qatê şeşan da avête erdê. Bi qîrin û hawar got; ”Bijî Apo û bijî PKK e. Berxwedan jîyan e”. Ez li berxwe didim hûn jî li ber xwe bidin. Ew gotinên wê pîrê dilê meriva qul dikir. Em destê wê maç dikin û li ber têkoşîne wê serê xwe ditewînin.

Dayika delal Xatice, Îro 15. 12. 1999 a ye.

Cenazê dayika delal ji aliyê hezar welatparêz ve hat pêşwazî kirin. Bi hezaran bi wê re çûn goristan. Li Kurdistanê gava cenazê wê di her bajarên Kurdistanê re derbas dibû bi hezaran dayika li hembera wê hurmet girtin. Bijî dayika delal digotin.

Dayika delal, Îro 16. 12. 1998 a ye.

Ew çalakiya dayika Xaticê li Ewrûpa dengekî gelek baş da.



Serokê Îtalya wiha got; «Bese êdî ma dayik xwe neşewtînin. Em mecbûr in pirsa Kurdî û pirsa serokê PKK e bi şekleka aşitîxane çare ser bikin. Serokê PKK e mêvane me yî herî ezîze, ew ji vê seatê şûnda serbestê çi dika ye bike, bi dilê xwe û bi xwe kîngê xwastiyê yê jî welatê me here»

Ew mesaja Dlema him em kêfxweş û him bêhêvî kirin. Lê ew rê jî nîşanî serokê me dike. Min gelek hewl da ku serokê Kurda bibe mêvanê me, lê biryar ji jor da tê û hatiye. Yanî dibêje ji min ewqas.

Belê ew tufana ku Amerîka û Roma reş bi dû serok xistî hîng dawîya xwe nehatiye.

Serok Öcalan wiha digotibû; «Qe hûn niha dibêjin Apo di qesra da û serfiraz û azad dijî, ez î di nav tengasiyeka pir mezin da me, ez î nikarî me di pencerê re mêzkim, an guçikekî perd hilnim, li derva mêzekim, li dor paş min bi dehan ajan û provaqator, polîsên tirk û yên CIA yên Alman digerine. Ji xwedê bitirsin, ewqas jî bes e lo ».

Bi vê daxuyanîya Massimo D' alema, serok spasiya xwe ji wî mêrxwazî re kir. «Ez sipas dikim di serî de Serok wezîrê Îtalî, parlemnterê Îtalî Serokê belediya Îtalî û dostên me din, ji dil û can pîroz dikim. Her tim li kêleka min bûn û ez bi tenê nehîştim».

**Hevalên delal**; Îro mêvanekî serokî pir ezîz û giran biha dostê gelê Kurd hat cem serok û ew mêrxwaza ziyaret kir DANYEL MITTERAND bû.



Wê Wiha got *«Ez li ser navê komela Fransan ji bo mafê mirovan dixebite hatim serdana serokê Kurda birêz Abdullah Öcalan. Ez amede me ji bo te her karê ku di dest min re bê bikim».*

Em bi wan gotinên wê xanimê pir kêf xweş bûn. Em ji we re sipas dikin.

Dayika delal, Îro 16. 12. 1998 a ye.

Li seat 12:00 Amerîka bi Îngilterê ve biryareka hevbeş girtin û bi bombeyên pir



mezin êrîşa ser Îraqê kirin. Bombe li ser gelê îraqê barand in. Bi rastî jî gava ku min li tv e dinêrî, wekî berfa bi kulî kulî dibarê bombe bi ser Îraqê da dibar in. Zarok der bi der direvin ji bo ku ji xwe di ciyekî ewle de veşerin. Li gor nûçeyên ku tên hatanî niha 5-6 kesan jiyana xwe ji dest daye, bi sedan kes mirine, bi hezaran xanî û avahiyên gelê Îraqê yî faqir bi ser da hilveşiyane.
Lê wekî hûn jî dizanin di sala 1990 an da pêva di navbera Îraq û Netewa yekitî de şer heye. Amerîka li hembera Îraqê di sala 1999 an da operesyoneka pir berfireh bi darxisti bû. Navê Operesyone jî Hirça çolê lê kiribûn.
Îro jî ew operesyona ku dibê, navê we kirin Operesyona Rovî.
Yanî ew tê we mane ku li deşta Ereba çiqas heyvan hene, ewqas Operesyonek çe bibine. Operesyona gur, Operesyona Mişk û kergû, opereyona şêr, operesyona ker, operesyona kuçikan hemûyê hê di rezê dane.
Hevala Zîlan û Sema û Dayika delal, Ez ji we re û ji xwendevanên me re bi kurtayî behsa şerê di navbera Îraq û Netewayên Yek bûyî de bikim.

22. 02 1998 an da. Serokê Netewa Yekbûyî, çû serdan Saddam Hiseyin. Bi Sedam re hev dîtin pêkanî û di navbera hevda peyman îmze kirin. Ji bo ku Înspektorê Atom bombesiyê bi şekleka azad û serbixwe kar li Îraqê bixebitin lêkolîna pêk bînin. Tu astengî li hembera wan nayên kirin. Kîjan avahî dibin bila ma bibin, kîngê xwastin dikarin qontrol bikin.

30. 12 1998 an da.
Ewlekarîya (güvenlik) konseye, ew peymana ku di navbera Sedam û Kofî Anan da bûyî pejirandin.

30. 06. 1998 an da.
Balafirên Amerîka balafireka Îraqê bombe kir. Sebeb? Sebep hêsan e. Balafirên Îraqê astengiyê li balafirên me dikine, sistema radare kilit kirine.

30. 07. 1998 an da.
Ew înspektorên nawnetawayî karê xwe li Îraqê qedandin û raporên xwe nivîsandin.
Di raporên xwe fermî da wiha gotin; Em gehştin wê encamê ku li Îraqê çekên kimyavî tunen, rewşa îraqê tekinikî û aborî jî nikare ku wan çekan bi kar bîne û tune jî.

03. 08. 1998 an da.
Axaftineka tûj serokê **UNICOM** kir. Em bi vê şekle nikarin li Îraqê bixebitin. Dibê rejima îraqê bi şekleka vekirî, bi me re bibêje, ka li kederê çekên kimyavî û biyolojik hene. Bi eşkeretî ji me re bibêjin. Em nikarin ku li Îraqê bi serbestî bixebit in. Eger rejima Îraqê wan daxwazên me nîne cî, emê Îraqê terkbikin.

05.08. 1998 an da.

Li ser vê daxuyaniya Richerd Butler, rejima Îraqê têkiliyên xwe bi Înspektorê UNSCOM Û IAEA birin. rejima Îraqê wiha got, Richer Butler ajane CIA ye. Di dest me da ji bo wî delîlên mezin hene. Em wî naxwazin. Eger ku we xwastiyê heyeteka xwe ya din bişînin.

10. 08. 1998 an da.
Serokê FN dewletên yekbûyî Kofî Annan Nûnerekî din dişîne cem Saddem ji bo li hev hatine. Ev nûnera neh roja li Baxdayê ma û bi Sadam re hev dîtin çêkirin û peyman îmze kirin. Sadam ji bo vê rewşe îqna kir.

31. 10. 1998 an da.
Rejima îraqê faşist bi temamî têkiliyên xwe bi UNISCOM re dibire.

02. 11. 1998 an da.
Amerîka bi Îngilterê ve li hev civîn ku erîşeka hevpar li hembera rejima Îraqê pêk bînin. Wan digel hev biryar standin û wiha gotin; *«Sadam ji merivatiy û aşitiye fêm nake, em ê êrîşa ser wî bikin û Sadam ji hole rakin».*
Hevala Zîlan û Sema; Ew dibêjin Sadam Faşistê ji aşitî ye fem nake. Nizanim ew her du faşist û emperyalistana çiqas ji aşitiyê fem dikine. Her halde bi milyona meriv min nekuştin? Wan faşistan nekuşt!. Her halde min li Latin Amerîka şer bi sala nedomnad, îro dibêjin ew şaşitiya me bû ku me li vê herêmê şer bi salan şer ajot. Wê faşistbûne li dijî me herr oj dikin. Lê serok Öcalan rûreşî û bextreşiyên giran dikin.

11. 11. 1998 an da.
Dîsa îro Amerîka û Îngilterê daxwazên xwe ducar kirin. Eger Îraq wan daxwazên me nîne cîh, em dê êrîşa ser Îraqê bikin.
NY û IAEA hemû karker û karmendên xwe jî Îraqê bi derxistin. Keştiyên mezin berva rojhilat rê standin.

14. 11. 1998 an da.
Gava ku **FN û IAEA** personalê xwe kişand. Îraqê zanî ku vê carê Amerîka û Îngilterê dîsa bi ser wan de boma bibarine. paşve gav avêtin. Ew dîsa daweta ser axa xwe kirin. Em soz didin we, vê carê hûn dikarin bi serbestî bixebit in. Em teva karê we nabin.

23. 11. 1998 an da.
Ku çiqas Sadam soz da bibû wan jî, hûn dikarin bi serbestî bixebitin, lê di bin re li riyan jî digerî ku wan asteng bikin. Balafirên wan ji hawa sahasiya xwe bi derxîne û êrîşa ser wan bike. Lê careke teşebûs kirin ku helîqoptera FN û NISCOM li erdê xînin. Amerîka ew hîşyar kirin, bi agir nelîzin!!.

25. 11. 1998 an da.
Îraqê biryar girt dîsa karên înspektoran asten kirin. Karên wan dan sekinandine. Înspektor nekirin avahiyên fermî.

05. 12. 1998 an da.
Ew dîsa bi şekleka nerm li hev hatin. Îraqê bi wan re gotin, gava ku hûn Wêneyên

avahiyên me resmî bikşînin, divê hûn ji me îzne bigirin. Dîsa teşqele di nav wan da çê bû.

10. 12. 1998 an da.
Înspektoran xwastin ku hemû avahiyên partiya Baas qontrol bikin li hûndirê avahiya lêkolîna bikin. Îraqê destûr neda vê xwastina wan. Her der jî Înspektoran re qedexe kirin.

15. 12. 1998 an da.
Şefê Înspektora Richerd Buttler, hemû roporên xwe nivîsandî û girtî pêkeşî Qonseya ewlekariy kirin. Êdî tu derfet neman ku em li Îraqê lêkolîn û karên xwe bikin. Her ciyên ku hevalên me diçin, ew me dişopînin û astengiya li ber me dertêxînin.

16. 12. 1998 an da.
Êdî êrîş nayê sekinandine. Îro di seat 24.00 an da bi çekên mezin êrîşa ser Îraqê kirin. Bexdad dan ber bomba.

17. 12. 1998 an da.
Şer hê ji li Îraqê dijwartir dibe. 12 balafirên Amerîqî û Îngilîzî ji cem dostên xwe Roma reş firiyan û Îraq bîstçar seata bombe kirin. Roma reş dîsa ji qalikekî kete qalikekî. Ji şekleke kete şekleka ne mirovatî. Ji aliyê din de balafir ji Arabistana Sudî jî firyan û Îraq bombe kirin.
17. 12. 1998 an seat di 18,30 dîsa bomabeyên mezin bi ser Baxdadê da barandin. Di vê êrîş e da nêzika 200 bombe hat avêtine.

13. 01. 1993 an Balafirên Amerîka û Îngilterê bombe kirin. Hemû awahiyên eskerî û sanayî û heta nexwaşxanê û dibistan her der hat bombe kirin.

17. 01. 1993 an da.
Keştiya Ameriqa bi navê ORLOG nêzikî 20 û 30 robotên missiler şandin Îraqê. Fabrîqa ku çekên kimyavî bi dertêxine bi erdê re kir yek. Bi wan bombana çar kesên sivîl mirin, bi qasî 40 kesî jî birîndar bûn.

18. 01. 1993 an da.
Dora dina rojê dîsa bi balafiran Baxdad dan ber bomba. Bîst kesan di wan êrîşan de jiyana xwe ji dest dan. Ewqasa jî birîndar bûn.

23. 05. 1993 an da.
Du keştiyên Amerîkayê mezin bomba şandin ser Îraqê, bi vê êrîşê xwastin ku avahiyên polisên sivîl û ajanên Basse xirab bikin.

03. 09. 1996 an da.
Hêzên Sadam Başûra Kurdistan dagir kir. Bi sedan kes birîndar bû. Amerîka bomba bi navê KRYSS missiler şand ser Baxdayê.

18. 12. 1998 an da.

Hêzên Amerîkî îro dîsa bi dehan û bîstan bi ser Baxdadê da bombe barand in. Wan rojana serê wî di teşqeleka mezin daye ji bo Monicka Lewskî. Wî xwast ku bi vê bombe kirine xwe reyagehştiya cîhane û reyagehştiya Amerîka bixapîne û rojeve biguher e. Zatê gava ku serê wan dikeve teşqelê, êrîşa ser dewletên misliman dikin.

Dayika delal, îro 19. 12 1998 a ye.

Ji roja ku qurşuna azadî û serxwebûne di kezeba dijmin de hatiye xarê pêva. Dewleta Roma reş bi dizî û eşkerê tê ji ber karxana, ji ber zanîngeha, ji ber mal, keç û lawên me direvîne û dibe dikuje. Dê û bavên wan bi rojanê ku li wan digerine lê nabînin. Lê, dûre cenazê wî/wê an kêleka rê, an di korteka îsis an li kêleka behrekê ew mirî tên dîtin. Ew bûyarên wiha hetanî roja ma îro bi seda û dusedan û bi hezaran bûn û hê jî dibin.

**Ez ji we re qala wan dayikana bikim.**



Îro **188** heftene ku dayik her roja roja şemiyê tên ber avahiya Galatasaray lisesî yê di destê wan de sûretên law û keçên wan, dewleta Romê reş şermezar dikin. Dewletê biryar girt ji wî hefteyî şûnda qedexeye ku dayik bên ber avahiya Galatasaray lisesîyê ji bo şermezar kirine. Lê wî heftî jî dayika hatin ber Galatasaray Lisesîyê Kûlilkên kesk û sor û zer dan polîsa. Lê Roma reş ji mirovatiyê fem nake, wan li dewsa gulên kesk û sor û zer copên xwe dane wan. Polîsên faşist êrîşa ser dayika kir, bi şekleka pir hovane li wan da, hemû bi erdê re kaş kirin û birin li erbê xwe bi zorê sîwar kirin, du rojan li ser wan îşkence kirin.
Wan bi polîsan re wiha got; « *Vê jî bîrnekin, hûn me bikujin jî, bi darda bikin jî, em ê heftê tê jî bên, hetanî ku em wenda yê xwe nebînin, em ji pîsta we nabin. Destê me li pista we ye»*.
Ez îro dixwazim ji we re qala du û an sê dayikên şemiyê bikim û bidim bidim nasandin e.

EMÎNE OCAK

Ez Emînê Ocak. Ez diya Hesen Ocak im. Hesenê min polisên dewleta Faşist di 21.03. 1995 an da girtin bin çava, di **26 03. 1995** an de li daristana Beykozê cenazê wî hat dîtine. Ez qetilê lawê xwe dixwazime. Ez ê pîr im. salên min nêzika 75 an e. Va cara şeşaye ku ez tê me girtine û min dibine qerekol bi rojan li min didine. Hatanî xwîn di laşî min de dimeye li min didin. Min bi wan re got: ez a bêm û piştgiriya dayikên din bikim. Ma tu şika we ji wê tune be! Min ewlede bedenê xwe ji we re kir qurban. Hetanî xwîn di laşê min da dime eza bêm we şermezar bikim.




ZÛBEYDÊ TEPÊ

Ez dayika Ferhat Tepê me. Di 28 tîrmeh sala 1993 an de gava ku lawê min ji mal derket, ji aliyê polîsên faşist ve dest û pê bi têlan hatin girêdane û revandin. **9 tebaxe 1993** an cenazê wî li kêleka **Gola Hazarê** hat dîtine. Ez naxwazim ma tu xort û keçên me din di bin çavanda wenda bibin. Ez lawê xwe dixwazim. Ez her heftê roja şemiyê, bi zanayî têm vê derê, yên ku lawê min



birî û hevkarên wan protosto dikim.
Bi sedan dayikên wihayê dilşewatî hane. Bi deh hezaran dayikên Gerîlayê ku şehîd ketine hene. Ez êşên di dilî wan de, di dilê xwe de dizanim. Ew bi destê faşistan hat qetil kirine.

EZ DIYA METIN GOKTEPÊ FADIMÊ GÖKTEP e me.

Lawê min ji aliyê faşistan ve hat kuştine. Metinê min sibê qemera xwe kir dest xwe çû ser karê xwe. Bi êvare xebera wî ya mirniye hat. Polîsên Polîsê tirk dibêjin ; Lawê te Metin ji ser kursiyeke de gerbûye û pişt re miriye. Elbet ew derewa dikine. Kurê min bi îşkenca kuştin.



Lê diya wî wekî qehremanekî kete pê dewletê û destê xwe kir qirika wan û dewlet pişt re mecbûr ma û kuştina wî li xwe nan. **Metîn Goktepê Rojnamevan** bû.

îro 19. 12. 1998 a ye.

Îro dest pêka rojiyê. Îro alema Îslam radibe savura xwe. Lê ne di jiyaneka normal de. Di bin bombe emperyalistan da. Dayik zarokên xwe ji ber bombe faşistan di bine kozikanda(siğinak) vedişêrin.



Îro sê roj in Baxdat, Basra, Kerkûk tê bomba kirin. Hetanî roja îro înglîza û Amerîkana 300- 350 bomba barandin. Hemû bombe mezin **SCUT** bûn. Xeynî ji bombeyên dine biçûk.
Hevala Zîlan û Sema; Îro bajarê **BONN** e ji me Kurdan re bû war û mesken. Ji her derên Ewrûpa Kurd bezin hatin Bonn e. Ji bo serokê xwe, ji bo partiya xwe û piştgirî yê bidin serokê xwe.
Hevalên te, bi hezaran sûretê serokê ku bi salane li Almanya hatî qedexe kirine dest wan dabû. Bi çoşeka mezin dihatin meş e.
Dîsa mêvan û dostên me giran biha û hêja hebûn. Di jorî sed hezarî re welat parêz li Bonê ciyabûn. Dengê wan digehştê serokê xwe yî li Îmraliye dîl hatî girtine. Ew bi vî dengî dilxweş dibû, wî digot; «Ez ê laîqa we bibim» Meşvan jî bersiva serokê xwe didin, dibêjin; « em jî laîqa wî dibin ».
Îro bîst çar parti û şehsiyetên Kurde qedir bilind, li paytexta Belçîqa li hev civîyan. Ji bo Kongira netewî. Ew cara yekeme ku ewqas Kurd û şahsiyetên Kurd tên cem hev. Heta duh Kurd nedihatin ba hev û silav nedidan hev du. Lê îro rewş bi temamî hatiye guherandin.

îro 21. 12. 1998 a ye.

Taylan Özgür Kahraman jiyana xwe ji dest da.

Hevalên delal êdî ji her malekê ne şehîdekî xwe hey, du şehîd, sê şehid hene. Di 21 qanunê 1998 an da Xortekî bi navê **Taylan** Özgür Kahraman jîyana xwe ji dest da. Biryê wî Tayland jî di 14 îlone 1998 an li çiya yê Kato şehîd ketibû. Du xortên ku tu qemişê nabî li bejn û bala wan binêrî, şehîd ketibûn. Bejna herdu jî wek darê rihanê bûn. Diya wan jî di nav refên gerîla daye. Çek li milê wê, ji çiyakî xwe davêje çiyakî din î Kurdîstanê. **Şengê** xanim. Temene wê bi qasî 37- 38 salayê, lê gava ku tu sûretê we binêrî salên wê li dora 50 û 55 tên xuya kirin. Porê serê wê sipî bûye, bûyê berfa li ser çiyayê Keto. Lê di çavê wê de hêviya azadi û serxwebûne heye. Gava ku xebera lavên xwe ku şehîd dikevin dibihîze wiha dibêje; *«Elbet ez dayik im, min ew anin xwedê dane, ji dilê min du dezî qetin. Lê min ew diyarî welatê xwe kirin»* Bavê wan Comerd jî tanbûr kiriye dest xwe bajar bi bajar, welat bi welat digerê. Stranên li ser egit û mêrxazên, bi teybetî jî stranên dilşewatê, li şerê Dêrsimê hatî stirandine tîne zimen. Em destê we dayikê maç dikin.



îro 22. 12. 1998 a ye.

Di hemû avahiyên HADEP e da îro pênc rojin dayikên Kurd ketine gireva birçî bûne. Îro dawî li greva birçî bûne anîn. Lê polîsê faşist ew bi tenê nedihiştin. Her roj êrîşa ser wan dikir.



Serokê Öcalan jî daxuyaniyek da çepêmeniya cîhane.

«Ez bi teybetî ji serok wezîrê Îtalî birêz MASSIMO D' ALLAMA re spasiyên xwe dikim. Çi di destê wî re hat, ev alîkariya ji bo me kir, tu alîkarî û tu tişt ji min nehêvişand(esirgemedî). Lê gura êrîşa ser wî jî dikirin, dest û piyê wî girêdan. Ew ji hukmeta Rus û ji ya Yunanan ji xas/çêtir derket. Bi îrada xwe hereket kir.

Wezîrê karê derva LANBERTO DÎNÎ jî, li hembera min politiqa ku laîqa xwe meşand. Ez ji hemû dost û hevalên me biyanî û di serî da gelê me yî ku hetanî Romayê hatî di bin vê sermaya giranda, bi roja mayî sipas dikim. Deng û piştgirî ji hemû derên cîhane derket, baş û xerab. Deng ji her du partiyên Başûr derneket. Ma ew di xatirê wan da bimîn e».

îro 23.12. 1998 a ye.

Belê şhîdên delal; Me îro zehmet keşeka Kurda ku bi salan qîr û bara Kurda kişandî



rêwiya aliyê we kir. Wê delalê wiha got;
« Ji ku Apê Musê miriye ez tu rojan rehet ranazam, wî xwe tim da bû ber balgiyê min. Ez niha herim ba mêrê xwe.» Halê Enter jina Apê Musa.
Hevala Zîlan û dayika delal; Dinya yê guhên xwe kirine ti kes guh nade qîrin û hawara me. Malên me tenê şewitandi. Xwîna keç û xortên me mîna avê diheriq, gundên me tên şewitandin. Di zindanên Romê reş da goştê xortên me genî dibe. Dinya guh dide ser Kosovayê, lê ne Kurda. Amerîkî û Ewrûpî li Kurdên wekî Kek Mesût û Mam Celal digerine, wextê ku gotin; rabin radibin, rûnin rûdinin, bi PKK re şer bikin, hûn emir bikin begên me!
Roma Reş, Îsraîl û DYA lingê xwe kirine yek, êrîşên hovane dibine ser birêz wezîr Massimo Dellema ”We hembeza xwe ji serokê PKK e re vekiriye, em naxwazin ku serokê PKK e li Roma yê bi cî bibe. Ji bo wê dostê me tirk li me dixeyidine”. Elbet ew sîteman ne bi vekirine lê meriv baş hîss dike.
Îro dîsa xortekî Kurd xwe li bajarê Almanya şewitand ji bo dilsoziya serokê xwe.

îro 24. 12. 1998 a ye.

Îro alema xiristiyan cejna xwe pîroza olî pîroz dike. Serokê hêja li Roma li kêleka Watikxanê. Dengê ayin û beytan her derên Roma rapêçandiye. Serokê hêja di



navbera çar dîwaran de dest û pê lê hatine girêdane. Eger ku dera derva bikevê, gurên har, kuçikên birçî, hirçên hovê wî bi parçe parçe bikine. Romê reş wekî gurekî dev bi xwîn, xwe di kendalên Romayê de veşartiyê li benda nêçira serok in. Amerîka qatil û Ewrûpaya durûyî naxwazine ma serok li dewleteka Ewrûpayî bimîne. Dewleta Romê reş hinek dewleta pera dide, hineka dixapîne, yên mîna Rusayê ku muhtaca qurişan bûyî, tawizên pir mezin ji Amerika girtine ji bo girtina Serok. Nizanim çi bibe?!!.

Rewş berva xirab bûne diçe. Serok bi xwe jî dibe, ji bo min tufane Hz Nuh rabûyê ser piya.

Nizanim çima bextê me wiha reş e! Feleke hemû derd û kulên xwe dane me, me bi diyar û diyara digerîne. Ew gotineka Kurda heye;« ***Xwedê derd kul dane heyvanên dinya yê, wan qebul nekirine, gotine wan derd û kulan bi Kurda din***».



Raste jî. Îro li bajarê Wanê keçeka Kurda bi navê Hemdiyê Qaplan (Bermal) xwe li ber avahiya qereqol teqand.

Li aynî rojê Muhitin ışık li Dîlokê agir bi bedena xwe xist, ji bo dilsoziya serokê xwe yî hêja. Dewletên Emperyalist û hevkarên wan dixwazine, serî ji laşê veqetînin. Laşekî bêserî, laşekî mirî rih tê da nemayî. Laşekî wekî xaînên me. Laşekî wekî Celal û Mesût bidin Kurda. Lê birêz Apo wan daxwaz û xwastinên wan qabul nake.

Hemdiyê Qaplan( Bermal) û Muhitin ışık, Îro 25. 12. 1998 a ye.

Serokê hêja li li paytexta Îtalîya yê. Îro ji der û dorên cîhana Xiristiyan serokên wan ê



olî û rûhanî tên serokê xwe Pappa ziyaret dikin. Dînî ayinên xwe guhdar dikin. Lê ziyaretvanên serokê birêz Apo jî ji yê Pappa ne kêmtir in.
Îro mêvana serokê birêz Xanim Danyel Miteran de.
Îşev Pappa John Poul axaftina xwe dînî/olî kir. Bi Kurdî silav ji Kurdan ra jî şand. «Ser sala gelê Kurd pîroz be!» Ew peyva ku ji navbera levên wî derketî li alema Xiristiyan alaniyeka pir mezin da. Gotin Papa jî ciyê xwe li kêleka Apo girtiye û piştgiriya Kurdan dike. Dawiya axaftina xwe jî wiha got; *« Xwedê gelê Kurd biparêz e.»* Em jî wî mêrxazî û cejna wî pîroz dikin.

Hemdiyê Qaplan( Bermal) û Muhitin ışık, îro 29. 12. 1998 a ye.



Heval, dostên me ji ya berê pirtir piştgiriya me dikin. Îro li Yunanistane bi qasî 50 hezar îmzê hat berhev kirine, ji wan 210 kes parlementerê Yunanî bûn. Ew îmzana birin pêşkeşî berpirsiyarê Balyozxana Îtalî kirin. Hemû dêrên(kilîsê) Yunana jî ji bo serok, çangê xwe yî dînî lêdan.

Hemdiyê Qaplan( Bermal) û Muhitin ışık, Îro 31. 12. 1998 a ye.

Îro dawiya sala 1998 an e.

Sibê ser sala nûh yê. Sala 1998 an ji aliyê gerîla ve salake bi serkeftin bû. Lê dijmin jî vala nesekinî 365 roja li me zulm kir û xwîna me rijand. Em tazî, birçî cîhştin. Qîrê qîr û hawara me cîhane nebihist. Me dîsa serê xwe yî daye bin çengî xwe, li benda salaka



din bin. Ew gotinek heye dibêjin; ***«Dawiya tariyê ronahiyê, lê ew ronahiya hîng ji me dûr e».*** Cîhan niha bi rewşa Kosova yê re mijûl dibe û bûye. 30 milyon Kurd avêtiye bine bîrê. Gelê Kurd ji Tirkan, Ereb û Farisan re kirin yem.

Hevala Zîlan û Sema; Dostê gelê Kurd birêz Massimo D'alema, bi wezîrên Îtalî ve çepemeniyek bi darxist. «*Min dixwast ku ji bo Kurda gavek bavej im, lê Ewrûpa ez bi tenê cihştim. Min dixwast ku rewşa Kurda jî baş bibe. Serokê Kurda îro li ba me û mêvane me yî herî mezin û qedir bilinde. Ez ser sala milletê Kurd pîroz dikim*»**.**

Em jî ya dostên wekî te û cejna milletê Îtalî pîroz dikin, ji we re serkeftin dixwazin. Elbetê wan ji bîrnabin. Wan tiştanê di nava dîrokê de ciyên baş bigirin

Ser sala wê pîroz be! Sala 1999 ji gel Kurd re bibe sala azadî û serxwebûne.